Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1378 20-Gulan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Deqandina sembolan di çanda jinên Kurd de

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Deqandina sembolan li ser laş yek ji kevneşpiyên beribçav yê çanda jinên Kurd e, ew bi nasname û mîrateya gelêrî ve girêdayî ye û wekî amûreke xweşikbûnê dihat bikaranîn.**

Deqandina li ser laş di folklora civaka Kurdî de, bi taybetî di nav jinan de ku ew wekî şêweyek xemilandinê û ji bo îfadekirina nasnameya xwe ya çandî û civakî bi kar dianîn, beşek girîng bû. Berê, ev kevneşopî di nav dayikên dihat pratîkkirin, ku xal an sembol li ser şeklên heyv, roj, stêrk, an sembolên din bi wateyên taybet dihatin xêzkirin. Her çend ev adet bi pêşketina şêwazên jiyana nûjen re hêdî hêdî winda bûbe jî, ew di bîra gelêrî de wekî sembolek mîrata jinên kevnar dimîne.

**Jinên Kurd û parastina mîratê**

Jinên Kurd bi dehan salan e ku deqandina li ser laş dizanin. Ew bi karanîna amûrên pêwîst û materyalên kevneşopî yên wekî mûrek an komirê ku bi madeyên xwezayî re tevlihev bûye, li ser çene, eniyê, an jî nêzîkî lêvan dihat deqandin. Ev adet li gund û deverên gundewarî belav bû, li wir ew wekî beşek ji bedewiya jinên Kurd û nîşanek cudahiyê ya bi adetên civakî yên mîras ve girêdayî dihat hesibandin. Hin gotûbêj destnîşan dikin ku keçan ev deq di temenê ciwaniyê de, pir caran di dema bûyerên civakî de an piştî zewacê, wekî beşek ji rêûresmên kevneşopî yên ku ji hêla jinan ve di civaka Kurd de têne kirin, wergirtine.

Deqandin ne tenê xemilandinek demkî bû, ew xwedî gelek wateyan bû ku li gorî herêm, malbat û adetên herêmî diguherin. Li hin deveran, ew wekî sembola bedewî û inûsetê dihat hesibandin, lê li civakên din, ew bi parastina ji çavnebariyê an jî wekî nîşanek gihîştin û rewşa civakî ve girêdayî bû. Jinan deqandinê wekî beşek ji kesayetî û nasnameya xwe ya çandî didîtin, girêdana xwe bi kokên xwe û kevneşopiyên xwe yên kevnar re diyar dikirin. Deqandina gelêrî di nav jinên Kurd de bi stran û çîrokên kevneşopî ve girêdayî bûn ku bedewiya gundewarî û jiyana sade pîroz dikirin û wan dikirin beşek yekgirtî ya bîra çandî ya civakê.

Jinan di veguhestina vê adetê ji nifşekî bo nifşekî din de roleke bingehîn lîstin. Dapîr û dayik ji keçên ciwan re çîrokên li ser deqandin û girîngiya wan digotin, hewl didan ku kevneşopiyên gelêrî yên kevnar biparêzin. Deqandina dembolên reş aliyek ji jiyana civakî ya jinên Kurd di demên berê de nîşan dide, ku jinan kevneşopiyên gelêrî wekî beşek ji nasnameya xwe ya çandî diparastin.

Pêvajoya deqandinê gelek caran li malan an kombûnên taybet ên jinan dihat kirin, ku jinek xwedî ezmûn derziyek destan û boyaxên xwezayî bikar dianî da ku xala reş li ser çerm xêz bike. Tevî êşa ku keçan di dema tatoyan de hîs dikirin, gelek kesan ew wekî pratîkek xwezayî dihesibandin ku bedewî û pabendbûna bi adetên civakî nîşan dide. Ev rêûresm carinan bi stranên gelêrî û sohbetên jinan re dihatin ku atmosfera jiyana kevneşopî li gundên Kurdan nîşan didan û didan deqandin aliyekî civakî ku ji xemilandina sade derbas dibû.



**Kêmbûna wê di serdemên nûjen de**

Deqandin di dehsalên dawî de ji ber guhertina têgînên bedewiyê, belavbûna madeyên bedewiyê yên nûjen û zêdebûna hişmendiya perwerde û tenduristiyê, bi awayekî eşkere kêm bûye. Bandora medyayê û vebûna çandî jî di guhertina têgihîştina nifşê ciwan a li ser deqandinê kevneşopî de beşdar bûye û gelek ciwan niha wan wekî adetên kevnar dibînin ku êdî bi jiyana nûjen re li hev nakin. Digel vê yekê, hin jinên pîr hîn jî deqandinê xwe yên kevin diparêzin, wan wekî beşek ji bîranînên xwe yên kesane û mîrata çandî dibînin.

Deqandin aliyekî nasnameya jinên Kurd temsîl dike, ezmûnên jinan di civaka kevneşopî de û têkiliya wan bi adetên ku jiyana wan a rojane şekil dane nîşan dide. Ev sembolên sade xwedî nirxek dîrokî ya girîng in, ji ber ku ew aliyên jiyana jinan di demên berê de belge dikin û xwezaya civakê û têkiliyên civakî yên ku di wê demê de serdest bûn eşkere dikin. Parastina bîranîna vê mîratê ne hewce ye ku vegere pratîka wê, lê belê balê dikişîne ser belgekirina wê wekî beşek ji dîrok û çanda gelêrî ya jinên Kurd.

**Hebûnek di bîr û hunera gelêrî de**

Deqandina sembolên reş hîn jî di hin wêneyên kevin, berhemên hunerî û fîlmên mîratî de xuya dike ku civaka Kurd a berê nîşan didin, ku ew wekî sembolek dîtbarî ya ku jina gundî ya kevneşopî temsîl dike kar dike. Ev sembolên gelêrî beşek ji dîroka civakî ya herêmê pêk tînin û ji nifşên nû re şansek pêşkêş dikin ku jiyana jinan di serdemên berê de fam bikin. Deqandina sembolên reş yek ji sembolên kevneşopî ye ku bi jinên Kurd û çanda wan a gelêrî ve girêdayî ye û di salan de wateyên estetîk û civakî yên cihêreng hilgirtiye. Tevî kêmbûna belavbûna wê ya îro jî, ew hîn jî beşek ji bîra kolektîf a civaka Kurd û mîrata jinan temsîl dike û sadehiya jiyana kevneşopî û kûrahiya adetên ku ji nifşekî ve têne veguhastin nîşan dide.

Bi kamîreya Solîn Mihemed



## FERHENGA BIWÊJAN

**Gunehê te li stûyê te:**
- Êdî kêmayî ne ji cem min e; ez dixwazim.

**Her kes li ser miriyê xwe digirî:**
- Her kes dixwaze qenciya wî bigihe kesên nêzîkî wî; her kes ji bo kesên nêzîkî xwe diêşe.

**Her kes li ser miriyê xwe şînê digire:**
- Bi heman wateyê.

**Hêstirên çavan bideyn in:**
- Ku tu xwe li ser yekî biêşînî, wê ew jî rojekê xwe li ser te biêşîne.

**Holî got Golî; eger em milên xwe nedin ber Solî, kolika me nabe olî:**
- Eger em alîkariya hev nekin em mezin nabin.
(Kolik: Holik. Olî: Xaniyê du qat)

**Kew jê re firandin:**
- Alîkarî dayê.

**Li me bû Xizir:**
- Hatina wî ji **bo** me pir baş bû; em ji tengiyeke mezin rizgar kirin; haya me jê tinebû, lê alîkariyeke mezin da me.

**Mala xelke dişewitî, wî jî firîkên xwe li ber diqelandin:**
- Filanî nikariya pirsgirêka xwe çareser bike cîranê wî doza alîkariyê lê dikir.

**Pişta xwe da me:**
- Alîkarî bi me re nekir; em hiştin tenê.

**Serê min ji te re vala ye:**
- Ez amade me alîkariyê bi te re bikim.

**Ti kesî ez ji xelayê dernexistime:**
- Ti kesî alîkariya min nekiriye.

**Yê destê wî dar bigire:**
- Yê mezin bûyî; yê bikare dest hilîne; yê bikare tiştekî bike; yê zaroktî derbas kirî.

**Yê dixwaze rûyek reş e, yê nade her du rû reş in:**
- Eger xwestin kêmayiyek be, nedan du kêmayî ne.

**Yê rojên giran e:**
- Ji bo kesên durist ku di rojên teng de dibin alîkar tê gotin.

**Zibare başe ne li ser hêkeronê:**
- Mirov tiştên pir li hev par ve bike baş e, ne yên hindik.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Tirkiyê li hemberî rastiyeke ku sedsal jê direve ye

Ji destpêka "pêvajoya aştiyê" ve, dewleta Tirk hewl da ku xwe wekî aliyekî ku li aramiyê û bidawîanîna şer digere, nîşan bide. Lê tiştê ku li ser erdê diqewime, çîrokeke bi tevahî cûda vedibêje. Tirkiyê ne bi hişmendiya lêgerîna çareseriyê tevdigere...**R-3**

## Kewser bû qurbaniya hişmendiya zayendperest û paşverû



Zaroka bi navê Kewser bû qurbaniya zihniyeta zayendperest a malbet û civaka Iraqê. Bi sedên çîrokên bi êş yên mîna Kewserê li Iraqê bi awayekî veşartî hene. Ev bûyer rastiya domandina zihniyeta paşverû ya li hember jinê derdixe ber çavan.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1378 20-Gulan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# MECLISA GEL E, YAN A DESTHILATDARIYÊ YE?!

Parlamentoya Sûriyê di dîrokê de gelek qonax derbas kiriye, di serdema rêjîma Baasê de ew saziyek sembolîk bû ku di bin kontrola dewletê de dixebitî. Piştî hilweşîna Baasê, niha Sûriya nû li benda avakirina meclisekî demokratîk e ku nûnertiya hemû pêkhateyan temsîl bike û mafê wan biparêze. Lê hikumeta demkî mîna rêjîma Baasê, careke din polîtîkayên paşguhkirina gel û xapandinê dide meşandin.**R-5**




## Dema şer dibe polîtîkayeke sîstematîk; Şerê Îsraîl û Lubnanê



Ji 1948'an heya roja îro gelek caran şer û pevçûn di navbera Îsraîl û Lubnanê de çêbûne, ji avabûna Hizbullahê ve êdî hincetên Îsraîl ên êriş û operasyonan zêdetir bûne. Ev şer di hemdemî û mêjûya xwe de, dikeve nav planên Îsraîl ên Rojhilata Navîn a nû.**R-6**

## Ji ber barana zêde zeviyên kemûnê zerarên mezin dîtin



Cotkarê bi navê Ebdulhelîm Reşik ku berhema kemûnê çandiye diyar kir ku ji ber barana zêde û piştre germahî, di nav zeviyên kemûnê de nexweşî belav bûn û got, "Zeviyên kemûnê zerarên pir mezin dîtin."**R-8**

## Sîstema dadweriyê li Rojava




Herêma Rojava şahidiya modelekê dike ku ji sîstemên dadwerî yên kevneşopî cuda ye, ew li ser bingeha edaleta civakî û çareserkirina nakokiyan bi rêya saziyên herêmî ye, ev jî berovajî pêşketinên siyasî û dadwerî yên têkildarî entegrekirina dadweriyê bi hikumeta demkî ya Sûriyê re ye.**R-4**



Hunermend jî daxilî orkestraya reşkirinê bûn
Farûk Sakik R-4



Plana li dijî Başûrê Kurdistanê!
Dilyar Cizîrê R-6



Civakbûna li dora nirxên xwe bibe xeleka zincîrê, dikare bidome
Ehmed Hesen R-7



Kurd di hevkêşeya nû ya Sûriyê de û lêgerîna pêşerojeke demokratîk
Gulîstan Xalid R-10

# Kewser bû qurbaniya hişmendiya zayendperest û paşverû

Zaroka bi navê Kewser bû qurbaniya zihniyeta zayendperest a malbet û civaka Iraqê. Bi sedên çîrokên bi êş yên mîna Kewserê li Iraqê bi awayekî veşartî hene. Ev bûyer rastiya domandina zihniyeta paşverû ya li hember jinê derdixe ber çavan.

**Stêrk Mihemed**

Di dema dawî de li Iraqê zewaca bi temenê biçûk gelekî pêşketiye, zarok rastî destdirêjî, tundiyê û kuştinê tên. Herwiha zihniyeta zayendperest li hember jinê xwe didomîne, nepêkanîn biryara bav û bira dibe sedema kuştina jinê, li beramberî wê jî zagon bêdeng û kûre.



**Zihniyeta paşverûtiyê xwe berdewan dike**

Jin di her warî de dikarîbû ku bibe avaker û pêşeng, lê belê jin bi zihniyata paşverû ya mêr re rû bi rû dimîne. Hişmendiya zayendperest di nava civaka Rojhilata Navîn de li hember jinê bi sedê salane xwe berdewam û berfirehtir dike. Salên dirêje jin li hember hişmendiya baviksalar têkoşîn dike. Dikare were gotin ji ber zihniyeta ku li Rojhilata Navîn li beramberî jinê tê meşandin bûye korta fetsandina hebûn û jêhatiyên jinê. Em dibînin ku cîhan di her warî de pêşketiye û bûye avaker, lê herdem rastî li ser ekran û pey kemîreyan nayê dîtin. Rastiya pêşketinê di nava malbet û civakan de tê dîtin, lê ev yek bi hişmendiya li hember jinê re xuya dike ku hişmendiya paşverû û zayendperest xwe bi pêşketinên cîhanî re mezin dike.

**Zewaca bi temenê biçûk û bandora wê li ser zarokan**

Jin di temenê zaroketiyê de dibe bûk, li şûna ku bi perwerdeya xwe re mezin bibe, dibe xwedî mal û berpirsyariyên ne li gorî temena wê. Gelek malbat bi dare zorê û bi temenek biçûk jinan dizewicînin, wê yekê weke sitrandin ji keçikê re dibînin û ev yek kêfxweşiye ji bo wan, lê belê bi derûnî û fîzîka zarokan ku ne li gorî zewacê ye meyze nakin. Zarok di bin tundiya fîzîkî û derûnî re derbas dibin ku ev yek bandorê li kesayet û tenduristiya wê dikin. Herwiha ji perwerde û fêrkirina ku ji mafê her zarokekî ye qut dibin di heman demê de malbet û hevjîn wan qebûlnakin ku perwerdeya xwe berdem bike ji ber ku ew ji re şerm dibînin eger jin ji wan zanetir be. Ev keçik ji jiyana zaroketiyê qut dibe, pêşeroja xwe winda dike û xewnên xwe yê zaroketiyê dibin xeyal. Ew bi xwe zaroke û dibe xwedî zarok ku bi temeneke biçûk wan xwedî dike û herdu bi hevre di nava êş, azar û xeyalên zaroketiyê de mezin dibin.

**Kuştina jinan di bin navê namûsê de rawa dikin**

Sala 2025'an weka sala kuştina jinan hate îlankirin, di dirêjehiya salekê de li ser asta cîhanê bi hezaran jin hatin kuştin, lê ji beriya sala 2025'an de û piştî wê tundî, destdirêjî û kuştina jinan berdewam dikin ev bûyer piranî li welatên ereb tên dîtin wekê; Iraq û hwd…. Tundî û hovîtî li ser jinê tê kirin ji ber ku biryara bav, bira û hevjîna xwe qebûl nekiriye. Eger jin bi kesê ku bav û birê wê diyar kirî razî nebe di bin nave namûsê de tê kuştin.
Di bin navê namûsê de dixwazin li ser tevgera xwe ya hovane li beramberî jinê bigirin û hinceta wan di milê zagonê de hebe ku bi vî rengî kuştina jinan ji xwe re rawa dikin. Bi hezaran jin bûne qurbaniya vê zihniyatê, herwiha eger keçek bi kurê apê xwe razî nebe ji aliyê malbetê û kurê apê xwe ve tê kuştin û ev yek mafê wî tê dîtin herwiha diyar dikin ku ew keçik di bin navê namûsê de ji aliyê kurê apê xwe ve hatiye kuştin ku wî ev yek ji navê malbetê re qebûl nekir.

**Bûyerê ku li Iraqê rû da ye**

Keça 15 salî ya ji Iraqî ya bi navê Kewser Beşar El-Huseycawî li herêma Nehrewan a li Rojhilatê Bexdayê ji ber redkirina zewaca bi kurê apê xwe re, ji aliyê malbata xwe ve hat kuştin. Kewserê zewaca bi zorê ya bi kurê apê xwe re ku zilamekî ji wê pir mezintir bû red kir û hewlada ku bireve. Li gorî çavkaniyên mafên mirovan û platformên herêmî, ew ji aliyê bira, ap û kurê apê xwe ve li herêmeke çolistan hat kuştin û laşê wê hat parparçekirin. Tiştê ku raya giştî zêdetir hejand û tûreyî çêkir ew bû ku endamên malbat û eşîrê piştî kuştina wê, li ber deriyê malê bi dîlan û şahî bûyer wekî "paqijkirina namûsê" pîroz kirin.
Ev tawanê hovane li ser torên civakî û di nav rêxistinên mafên jinan de li Iraqê bû sedema nerazîbûneke pir mezin. Çalakvan daxwaza sizadana tund a kujeran dikin û balê dikşînin ser kêmasiyên zagonî yên ji bo parastina zarok û jinan li Iraqê. Bi seden çîrokên bi êş yên mîna zaroka bi navê Kewser li Iraqê bi awayekî veşartî tê meşandin. Bûyera ku rûdaye rastiya civak û zîhniyata li Iraqê li hember jinê tê meşandin xuya kir. Herwiha diyardeya zewaca bi temenê biçûk û dare zarê gelekî li Iraqê li pêş e. Di heman demê de ji aliyê zagonî û ewlehî ve hesab ji kesên sûcdar nehat xwastin ev yek diyar dike xwe zagona ku mafê jin û zarokan li Iraqê diparêze nayê dîtin, lê belê ji tundî û testdirêjiya li ser jinê re bêdeng dimînin.

# Di sîstemên dewletparêz de, bedena jinê dibe qadeke siyasî

**Navenda Nûçeyan**

**Dewlet û sîstemên desthilatdar bi rêya "Pêşesaziya modayê" bandoreke kûr li ser nasnameya jinê dikin. Bi navê modayê xwestine jinan ji cewhera wê der bixin û bi pêşesaziya modayê bandor bibin.**

Hêzên sermayeder dixwazin jinê veguherînin wekî amûreke bazirganiyê. Sîstemên modern jinê ne wekî kesayetek, lê wekî "objeyek" ku divê were firotin an jî were nişandan pênase dikin. Moda li vir dibe amûrek ku cewhera jinê ya kûr vedişêre û wê tenê di çarçoveya "xweşkibûna fîzîkî" de sînor dike. Jin her tim bi qelsiyeke xwerû ya li hember kirînê tê tawanbarkirin, her çend pêwîstiya wê bi tiştê ku dikire nebe jî. Yekser dewletê yekdestkirina nasnameyê bi dewlet û kapîtalîzm bi rêya modeyê "qalibekî standard" ji bo jinê diafirînin. Jinên ku nazewicin ji vê qalibê derkevin neçar dimînin ku li gorî pîvanên ku sîstemên danîne cil û bergan li xwe bikin, ku ev yek cewher û azadiya wan a resen ji destê wan digire. Jinek dikare bifikire ku xemilandina wê tenê rûberî ye û bandorê li ser aqilê wê nake, ku ew dikare azad be tevî şêwaza xwe ya berfireh.

**Dûrxistina ji çanda civakî**

Cil û bergên ku ji cewher û koka civakê tên wekî cilên neteweyî û çandî, di bin navê modernîzmê de jin tên biçûkxistin. Bi vî awayî jin ji koka xwe ya dîrokî û civakî tê qutkirin û dibe perçeyek ji çanda serfkirinê ya global. Em dikarin bibêjin ku moda jinê ji cewherê wê dûr dixe û moda ne tenê li ser bedewiyê ye. Lê amûreke pergalê ye ku jinê ji hêza wê ya cewherî, aqilî û çandî dûr bixe û wê bike berhemek ku li gorî daxwaza bazarê tê guhertin. Cilên kurdewarî an jî yên herêmî li ser bingeha rehetî, pîrozbahî û sembolên siruştê hatine avakirin. Dema jin van cilan li xwe dike xwe ji standarda bedewiyê ya ku kapîtalîzmê li ser jinê ferz kiriye, rizgar dike.

**Kontrola li ser bedena jinê**

Di sîstemên dewletparêz de, bedena jinê dibe qadeke siyasî. Çi bi rêya qedexekirina hin cilan be, çi jî bi rêya ferzkirina hin şêwazên modayê be. Dewlet hewil dide kontrola xwe ya li ser civakê bi rêya bedena jinê pêk bîne. Çima di her kilîpeke cil û bergan de bedena jinê didin hemberî Tv yan û rûyê wê bi rêya reklam jinê ji cewher û hebûna wê der dixin. Sîstemên desthilatdariyê di her pirojeyên xwe yên kontrolkirinê de jin dane pêş û hiştine ku ji zihniyetên xwe yên dişibin bedena xwe jê vekişê û li gorî wan bimeşin. Dewletê bi rêya modayê jin ji rola wê ya jintiyê derxist û dixwaze jin li gora sîstemên desthilatdariyê tevbigere. Dewlet û pergalên desthilatdar sîstemên kapîtalîst bi rêya medya



civakî hişmendiya modayê ne wekî "tercîhekê" lê wekî pêdiviyekê li ser civakê ferz dikin.

**Bandora medya civakî wekî amûreke kontrolê ye**

Sîstemên desthilatdar medya civakî bi kar tînin da ku nîqaşên li ser azadî û cewherê jinê beralî bikin ber bi moda û bedewiya fîzîkî ve. Dema jin li ser medya civakî tenê bi modeyê re mijûl bibe, hêza wê ya siyasî û civakî ya cewherî qels dibe. Herwiha keç û jinên ku gelekî bi medya civakî ve hatine girêdan dema ku dewlet bi vî awayî qalibekî yek rengî diafrînin kesên ku li derveyî vê qalibî xwe kêmasî hîs dikin. Bi rêya sosyalmediya, her hefte ji aliyê dewletê ve "trendekî nû" derdikeve. Ev yek dihêle ku jin her tim xwe mecbûr hîs bike ku tiştên nû bikre. Dewletên sermeyedar vê yekê wekî piştgiriya aboriyê dibîne, lê di rastiyê de ev yek cewherê jinê yê afirîner kêm dike û wê dike koleya kirînê.



# Zilamê duyemîn ê DAIŞ'ê Ebû Bîlal di operasyonekê de hat kuştin

'Zilamê duyemîn' di nava DAIŞ'ê de Ebû Bîlal El Mînokî di operasyonekê de hat kuştin. Serokê DYA Trump got, "Bi kuştina wî re dê êrişên DAIŞ'ê li seranserê cîhanê qels bibin".

**Navenda Nûçeyan**

Roja Şemiyê di 16'ê Gulana 2026'an de, Serokê Amerîkayê Donald Trump kuştina Ebû Bilal El Mînokî, ku wî ew wekî 'Zilamê duyemîn ê çeteyên DAIŞ'ê li seranserê cîhanê bi nav kir, di operasyoneke hevbeş a di navbera hêzên Amerîkî û Nîjeryayê de ku roja Înê, 15'ê Gulana 2026'an de pêk hat, ragihand. Trump operasyon wekî operasyoneke ku bi baldarî hatiye plankirî û pir aloz bi nav kir.
Her çend cihê rastîn ê êrişê nehat eşkerekirin jî, lê rayedarên Nîjeryayê paşê diyar kirin ku operasyon li Hewza Gola Çadê, herêmek ku demeke dirêj wekî baregehek ji bo komên çekdar û terorîstan yên ku li seranserê Nîjerya û welatên cîran tevdigerin, hatiye kirin.
Ev operasyona ya herî nû di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Nîjeryayê de ye, ji dema ku hevkariya wan a ewlehiyê di sala borî de dest pê kir, piştî îdiaya Trump ku di krîza ewlehiyê ya Nîjeryayê de Xiristiyan dibin hedef herwiha gefên wî yên destwerdana leşkerî ya Amerîkayê.
Di sala 2018'an de, navê Ebû Bilal El Mînokî, serçeteyê DAIŞ'ê li Afrîqaya Rojava, derket holê. Derketina navê wî piştî bidarvekirina Maman Nûr hat, ji wê demê de ve ji serçeteyeî herêmî bû zilamê duyemîn ê rêxistinê li seranserî cîhanê.



Piştî ku Ebû Bilal serokatiya rêxistinê girt ser xwe, bi dehan ji çekdarên ku li Rojhilata Navîn perwerde dîtibûn, tevlî rêxistinê li rojavayê Afrîqayê kirin. Ev gavek bû sedema cudahiyekê di cewher û asta operasyonên terorîstî yên rêxistinê de.
Di rojên beriya kuştina wî de, Ebû Bilal operasyonên xwe ji herêma Benî Şêx a eyaleta Borno li rojhilatê Nîjeryayê dimeşand, ku di mehên dawî de bibû cihê operasyonên DAIŞ'ê.

**Zêdebûna oprasyonên terorê**

Bi radestkirina Ebû Bilal ji bo birêvebirina DAIŞ'ê li Rojavayê Afrîqayê, çalakiyên terorê li herêma Peravê û Gola Çadê bi awayekî balkêş zêde bû.
Li gorî Texmînên Terorîzma Cîhanî ya 2023'an, serokatiya DAIŞ'ê ji aliyê Ebû Bilal ve li Afrîqaya Rojava bi zêdebûna ji sedî 2 hezar di hejmara qurbaniyên êrişên terorê de li herêma Peravê re hevdem bû.
Li gorî Texmînan, ji deh welatên ku herî zêde ji terorrê bandor bûne, pênc li herêma Peravê ne. Ev herêm ji sedî 19 êrişên terorê yên cîhanî û ji nîvê zêdetir qurbaniyên girêdayî terorê li seranserê cîhanê pêk tîne.
Li gorî Databasa Cihê Şerên Çekdarî û Bûyeran (ACLED), di sala 2025'an de Nîjeryayê zêdebûna herî mezin a qurbaniyên terorîzmê li cîhanê tomar kir, ku ev hejmar ji 513 kuştinan gihaştiye 750 kuştinan û ji sedî 46 zêde kir.
Çarêka yekem a 2026'an di nava 10 salan de ya herî kujer bû, di çarçoveya zêdebûna êrişan bi rêjeya ji sedî 25.

**Ebû Bîlal çawa kar dikir?**

Di heft salên borî de, Ebû Bîlal karîbû avahiya operasyonî ya rêxistinê li Rojavayê Afrîqayê xurt bike û şiyanên wê yên meydanî zêde bike. Ebû Bîlal hewil da ku hêmanên biyanî yên xwedî tecrûbeyên şer a berfireh ji Rojhilata Navîn û deverên din ên di bin kontrola komên cîhadîst de tevlî xwe bike, van hêmanan karîbûn di hawîrdora pevçûnê de taktîkên nû pêş bixin.
Di heman demê de Ebû Bîlal taktîkên nû di operasyonên DAIŞ'ê de destnîşan kir, di nav de berfirehkirina êrişên danê şevê li ser avahiyên leşkerî, destpêkirina êrişên hevrêzkirî, bicihkirina dronên çekdarî ji bo çavdêrî û êrişê, ji bilî karanîna teqemeniyên destçêkirî û baştirkirina ragihandina meydanî û hevrêziya lojîstîkî.
Derketina holê ya dronên çekdarî di pevçûnan de ji bo plankerên ewlehiyê yên li welatên herêmê cihê fikarê bû. Di demên dawî de, Ebû Bîlal ji bo ku seçete neyên hedefgirtin, taktîka bikaranîna yekîneyên veguhêz bi kar aniye.
Herwiha danasîna sîstemên teknolojîk jî zêde kir, ku ev yek jî hewldanên hikûmetan ji bo qelskirina şiyanên şer ên komên terorîst asteng dike, ku bi saya teknolojiyê ew karîbûn bandora xwe berfireh bikin û li hember êrişên hêzên hikûmetê li ber xwe bidin.

**Trump kuştina 'Zilamê duyemîn' ê DAIŞ'ê ragihand**

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) got, 'Zilamê duyemîn' ê çeteyên DAIŞ'ê li cîhanê Ebû Bilal El Mînokî di operasyoneke hevbeş a Amerîka û Nîjeryayê de hat kuştin.
Trump anî ziman ku operasyon piştî şopandina tevgerên El Mînokî li Afrîqayê pêk hat û got, bi kuştina wî re dê operasyonên DAIŞ'ê li seranserê cîhanê qels bibin.

# Pakistan bi germahiyeke bilind re rû bi rû maye

**Navenda Nûçeyan**

**Di nava hişyariyên zêde li ser encamên guherîna avhewayê li Başûrê Asyayê, herêmên berfireh ên Pakistan û Hindistanê pêlek germahiyê ya neasayî ya dijwar dijîn.**

Li Pakistan û Hindistanê pêlek germahiyê ya neasayî ya dijwar tê jiyîn, di çarçoveya bilindbûna germahiyê ku gihaştiye astên herî bilind, ev yek jî giraniyek zêde li ser nifûs, binesazî û xizmetên tenduristiyê çêdike, di demekê de ku hişyariyên li ser encamên guherîna avhewayê li Başûrê Asyayê zêde dibin.

**Pileyên germahiyê yên hatine tomarkirin**

Li gorî rojnameya Brîtanî The Guardian, li Keraçiyê, ku bajarê herî mezin ê peravê yê Pakistanê ye, germahiya bilind veguheriye krîzeke rojane ku jiyana bi milyonan kesan, nemaze li taxên xizan û deverên peravê yên ku ji qutbûna elektrîkê û kêmbûna avê dikişînin, giran dike.
Di mehên Nîsan û Gulanê de, germahî li herêma Sind a başûrê Hindistanê ji rêjeyên xwe yên demsalî yên asayî derbas bû û li gelek deveran di navbera 44 û 46 pile de bû.
Li gorî daneyên Daîreya Çavdêriya Avhewayî ya Pakistanê, ku hişyarî da li ser îhtîmala berdewamiya hewaya germ di hefteyên pêş de, germahiya herî zêde li Keraçiyê 44,1 pile tomar kir, ku ji Gulana 2018'an û vir ve ev germahiya herî bilind e.
Li Hindistanê, pêlên germê yên bi heman rengî li eyaletên Rajstan, Gujarat, Maharashtra û hin deverên bakur û navenda welêt xistin, germahî li hin bajaran ji 45 pileyê derbas bû, ji ber vê yekê rayedar hişyariyên tenduristiyê dan û asta hişyariyê bilind kirin.

**Êşên rojane**

Her çend Keraçî bi gelemperî bi avhewaya xwe ya nerm tê nasîn ku ji ber bayê ji Deryaya Ereb tê jî, niştecih dibêjin ku germahî di salên dawî de dijwartir bûye.
Bajar hîn jî bîranînên pêla germê ya karesatbar a ku di sala 2015'an de lê da û bi hezaran ji ber jiyana xwe ji dest dan, dihewîne, di heman demê de di havîna 2024'an de jî mirinên ku ji ber germahiyên bilind ve girêdayî bûn.

**Zêdebûna zextê**

Li nexweşxane û navendên tenduristiyê, bandorên pêla germê bi awayekî zelal dest pê kirine, nemaze di nav zarok û kesên bi temen mezin de.
Li gorî rojnameya Brîtanî, pisporên avhewayê piştrast kirin ku "pêlên germahiyê yên dubare li Başûrê Asyayê êdî ne bûyerên îstîsnayî ne, lê bûne beşek ji şêwazek zêdebûyî ya ku bi guherîna avhewayê û bajarvaniya bilez ve girêdayî ye."
Tîma Global Weather Attribution, ku pisporê lêkolîna diyardeyên avhewayê ye, destnîşan kir ku



guherîna avhewayê ya ji ber çalakiya mirovan îhtîmala pêlên germê yên wiha sê qat zêde kiriye û zelal kir ku germahiyên heyî di serdema berî pîşesaziyê de bi qasî pileya Celsius kêmtir bûn.

**Bangên tevgerek lezgîn**

Li gorî Daîreya Çavdêriya Avhewayî ya Pakistanê, di dehsalên dawî de germahiya navînî li herêmê bi qasî 1.4 pileya Celsiusê zêde bûye, lê tenê li parêzgeha Sindê germahî bi qasî 1.7 pileyan zêde bûye.
Pisporan diyar kirin ku zivistan kurttir û germtir bûne, di heman demê de havîn dirêjtir û dijwartir bûne, ku ev yek jî ji bo hikûmet û pergalên tenduristiyê dijwarîyên zêdetir derdixe holê.
Herwiha pisporan banga tedbîrên lezgîn kirin, di nav de avakirina navendên sarkirinê yên giştî, berfirehkirina gihaştina ava vexwarinê, xurtkirina amadekariya bijîşkî û destpêkirina kampaniyên çandina daran ên berfireh di nav bajaran de.

# Wê rojê min roj nedît û ez bi windabûnê re bûm yek

**Cûdî Îbrahîm**




Ez ne weke her rojê ji wê xewê şiyar bûm, di dilê min de bi hezaran tofan, ez dihejandim. Çavê min li riya birayê min bû, dilê min bi şewat bû, weke volkanekê bû, hin caran ez di bin betaniyê û serê min li ser balîfê, ez ji xwe ra digriyam û tenê digriyam. Heta berbanga sibehê, hîskîniya min stêrkên şevê jê şerim dikirin. Heyv tune bû. min li dora xwe tiştekî ku ez hêviya xwe pê girê bidim tune bû. Navê min Emel bû ango bi Kurdî Hêvî bû. lê bedena min ya li erdê û hêsrên min yê ji baranekê jî zêdetir, qet hêvî jî nedida dilê min. temenê min jî 11 salî bû, lê ez bi hezaran salî bûm di wê demê da. Jiyana min ya bi qasî peyxemberekî dirêj bû. Di wê berbangê da ez li gundê xwe bi zarokan ra jî derneketim lîstikê, hew di nava qurzîka hindir da û li benda birayê xwe bûm. Min dizanî bû ku dê min tenê bihêle. Ez difetisim ji kerba ra. Cara dawî jî min birayê xwe nedît û dilê min pêra tevizî û min got tiştek pêy hatiye. Çar mehan, lê bi qasî çar serdeman ez li bendê bûm û ez her rojê jî digriyam.

Her rojê ez derdiketim û min sebra xwe bi berhevkirina gulan dianî. Lê min di her gulekê da hêsrên xwe jî dibarandin û bi dev diketim erdê. Hindirê min da her tişt wêran bûye, qey komkujiya geliyê Dêrsimê û Helebçayê lê hatiye, her tişt wêran e. Min digot qey birayê min êsîr e, lê min nizanî bû ku dê feleka xayîn ji bo ku min li ber dîwar bihêle, dê wiha bike û min tenê bihêl e. Min nizanî bû ku birayê min li ser axa sar û erdê qerimî bêy giyane. Ew li erdê ye, destê wî, rûyê wî, lingên wî, dêmên wî, cilên wî, çavên wî, lêvên wî, li erdê ye. Ez a reben jî dûrim ku li ser bedena wî ji xwe ra lorîkan bêjim û bigrîm. Min hîs dikirin hin caran ku canê xwe serma girtiye, li şûna wî min betaniyeke zêde dikir ser xwe.

Ew jî li ser wê axê, bi canê xwe yê tevizî, bi rûyê wî yê ku êdî naşibe dêmên wî yên kevin. Min her ew xeyal dikir, destê wî li ser axê, rojê dabû bedena wî, canê wî bi rojê gerim dikir û bi şevê jî sar dikir, porê wî weke berê bû, weke ku nû şeh kiribe, çavê min li her derê wî bû, ez digriyam û dişewitiyam. Min hin caran devê xwe dikir wî balîfî û ji bo ku giriyê min dernekeve û dayîka min ya dilşikestî jî bi giriyê min nehise, min bi bêdengî hêsir dibrandin. Hin caran min û dayîka xwe jî bi wê şewatê em bi hev ra digriyan. Serê min li ser çonga wê, destê wê li nava porê min. Hêsirên wê li rûyê min diketin û hêsrên min jî li ser lingên wê û bi canê wê da diçû. Kerba me, ewir, ezman, stêrk û heyv derbas dikir.

Ji wê şeva ku ez ê jêra bêjim şeva bêy deng, bêy hest, bêy can, bêy heyv û stêrk, heta ez dikarim bêjim jî bêy min. ez bi tenê. Kezeba min weke dîwarekî ku sed sal lê çûbe û tenê hin ax û kevir lêbe, deriyê wê yê zengarî ku dayîkekê bi hêviyekê ew derî lê danîbe lê piştî wê bahoza ku ne dîwar û ne jî derî lê mabe, ew hilweşandibe. Tûrikê wê li pişta wê û ew ber bi cihekî nediyar ve, weke min bêy hêvî be û li wan deran bi tena xwe bigere û pejna her kesî jî jê pirs bike.

Ez jî wiha bûm. Birayê min li wî erdî sar bejna wî ya weke Kurdistanê êşiyayî û li ser erda cîhanê razayî ye. Bi wê rojê ra bavê min biryar da ku biçe Hesekê da ku ez jî nas bikim bê birayê min çi pê hatiye, dilê bavê min jî hinekî rihet bibe û giriyê dayîka min jî kêm bibe. Lê Ez? Ez ê çawa bikim. Çavê min li riyê bû. çavê min li demijmêra bû, çavê min li her derê bû.

Dem ber bi rojava bû, bejina rojê êdî diçû û dê dîsa jî tarîtî bikeve erdê. Ez li ber deriyê malê rûniştîbûm. Ji nişka ve tilefona mala me lêda. Dema ku deng ji wê odeya mala me derket û dest bi hawarê hat kirin. ez bi çong ketim erdê. Lingên min min ranedkirin ku ez ber bi wê odeyê va biçim. Di navbera min û wê odeyê da ew derî û dîwar bû. lê deng dihate min ku çibûye. Min hîna jî nizanîbû ku Şehîde an jî Esîre.

Min ji xwe re digot ku dibe esîr be û ew deng hawara kêfxweşiyê be. Min dîsa hêviyê xwe qut nekir, ez bi lingên xwe rabûm û min destê xwe avêt wî derî û min dît malbata min digrîn. Li mala me ji bo Birayê min şahî bû. Lê şahiya çi? Li der dora mala me bi sedan erebe hatin seknandin û bi hev ra bang dikirin û digotin `Şehîd Namire` a wê demê ez bi dev ketim erdê û min dest bi girî kir. Kanî jî ne wiha ye. Hawara min ezmanê li jor diqelişand. Her kesî li çavên min dinerî û ez digriyam. Birayê min şehîd e.

Di wê rojê da ez bi dev ketim erdê, devê min tijî ax bû û ez jî weke biryaê xwe li wî erdê sar min pal da. Dema ku min çavê xwe vekir rojek jî li ser min re çibû. Di destê min yê bi çûk de sîrom û derzî û min li dora xwe niherî. Min dît ez bi tenê me û min ew tenêtî ji xwe re weke fersendekê dît û weke dayîkeke dilşewat bi çend hêstiran ez giriyam. Hatin ez birim. Ez birim cihekî din. Min dît malbata min giştî hawara wan li ser wê tabûtê tê, ez sekinîm û hemşîretî li dora min bûm sîroma min rakiribûn. Gelo dikarin barê di dilê min da jî rakin. Ez wiha sekinî bûm û matmayî bûm.

Ez bi çend gavan meşiyam û min dît ew tabût rakirin û birin odeya xemilandinê. Ez û malbata xwe jî ketin wê odeyê. Li ser birayê min vekirin. Ez çûm ser tabûtê. Hawarê ev birayê min e. Min got tu çawanî Berxo. Navê wî Berxo bû, Berxo yekem care ku bersiva min nade. Min serî xwe danî ser serê wî, hêsrên min rûyê wî şil kir. Min ew rûyê wî maç kir û jêre got `Cihê te bi gasî vê gerdûnê fereh be` û min xatir jê xwest. Weke berê bû. natibû guhertin pir. Hinekî dêmên wî hatine guhertin. Bi kenekî li ser rûyê wî. Min xatir jê xwest.

Ez li merasîma şehîdan bûm û di herdû destê min da jî ew sîrom. Min bi êşa wê hîs nedikir weke êşa birayê xwe. Ez nediêşiyam. Wiha mabûm matmayî, min li wêneyê wî dinerî û piştî merasîm jî bi dawî bû. min bi destên xwe ax bir ser tabûta birayê xwe û dûra li goristana şehîd Dicle min dilê xwe xiste bin axê û ez çûm……

Ev çîrok bi devê Emel ya 11 salî ye bi bendewarî bû li benda birayê xwe. Min çîroka wê di roja merasîma birayê wê Berxo de ji devê wê bihîst û ez jî pêre hinekî giriyam. Lê ji min re jî got ew ji bo azadiya me Şehîd bûye. Min ew hembêz kir. Çîrokeke zarokeke bi êş ya ji Kobanê. Li benda birayê xwe bû. Lê birayê wê bi şêwazekî ku ne di xeyalê wê de bû hatibû. Emel navekî ku dê her bi min re jiyan bike, dê êşa wê jî di mejiyê min dernekeve.

## Kurd di hevkêşeya nû ya Sûriyê de û lêgerîna pêşerojeke demokratîk


Gulîstan Xalid

Şerê ku bi salan di Sûriyeyê de dom kir, di encama wê de ne tenê bajar hatin wêran kirin, lê di heman demê de têgihîştinên kevin ên dewlet, têkiliyên civakî û modelên klasîk ên desthilatdariyê li Rojhilata Navîn jî xiste bin pirsyareke kûr. Îro, dema ku nîqaşên li ser "Sûriyeyeke nû" piştî şer diqewimin, yek ji pirsên herî bingehîn bêbersiv dimîne: Gelo Sûriye bi rastî jî êdî hevjiyana demokratîk ava dike, an jî ew ê bi gotinên nû zîhniyeta kevn a dewleta neteweyî ji nû ve hilberîne?

Di navenda vê pirsgirêkê de Kurd û bi taybetî modela rêveberiyê ya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derketiye holê hene. Ji aliyekî ve, gotinên "entegrasyonê" tên gotin, lê ji aliyê din ve, hewl tê dayîn ku zîhniyeteke dewleteke navendî ji nû ve were avakirin. Tam jî li wir nakokiya bingehîn derdikeve holê: Gelo tiştê ku tê nîqaşkirin bi rastî entegrasyona demokratîk e, an jî asîmîlekirina nasnameyên cûda di nava navendê de ye? Geşedanên dawî yên li Sûriyeyê nîşan didin ku ev ne tenê pirsgirêkek siyasî ye, lê di heman demê de pirsgirêkeke hişmendî û dîrokî ye jî.

Gereke baş bê zanîn ku aloziyên 15 salên derbasbûyî, û krîza dewletê li Sûriyeyê ne tenê leşkerî bû. Tevgerên gelêrî yên ku li Sûriyeyê dest pê kirin ne tenê li dijî krîzên aborî an pirsgirêkên ewlehiyê bûn. Ew her wiha nerazîbûnek li dijî nasnameyên ku bi dehsalan hatibûn înkarkirin, îradeya civakî ya ku hatibû tepeserkirin û îdeolojiyek dewletî ya yekreng bûn. Bi taybetî ji bo Kurdan, pirsgirêk ne tenê li ser mafên çandî bû. Ji ber ku bi salan, Kurd ji hemwelatîbûnê bêpar man, zimanê wan qedexe bû, ew ji hêla siyasî ve hatin paşguhkirin û bi awayekî sîstematîk derveyî wê hatin hiştin.

Dibe ku hikûmeta nû îro zimanê xwe guhertibe, lê pirsa rastî ev e ku gelo zihniyeta wê guheriye. Ji ber ku li Rojhilata Navîn gelek caran vegotinên "serdema nû" hatine pêş, lê zihniyeta dewleta kevn bi awayên cûda vegeriyaye. Avahiya navendî hatiye parastin, tenê têgîn guheriye. Ger îro, di bin navê entegrasyonê de li Sûriyeyê, armanc ew be ku hemû cudahî di navendekê de werine helandin be, ev ne çareseriyek demokratîk e; ev tê wateya ji nû ve hilberandina krîza kevn e.

Ger ku dewlet xwedî hişmendiya berê be, kurd ne kurdên berê ne. ne li Rojava ne jî li tu parçeyeke din kurd bê bijartek û bê rêxistinbûyîn nînin. Ger ku îro li her derê kurd piştî têkoşîna bi salan dibêjin em amedene bi dewletê re entegre bibin, ev bi baweriya avakirina pêşerojeke nû ve dibêjin û ji bo wê gav davêjin. Kurdê ku ji mirinê natirse ji bo jiyana azad bi baweriya ku ne bi şer, bi Entegresyona Demokratîk ve jî dikare bighêje vê ermancê, nêzîk dibe. Îja kurd bi çavkoriyekê vê nakin, bi nasîn û zanîna ku Entegrasyona Demokratîk çi ye, tevdigerin….

Dom dike



# Di meha Gulanê de; 29 kuştî û birîndar ji ber teqemeniyan

Rewangeha Sûriyê ya Mafên Mirovan da zanîn ku ji destpêka meha Gulanê û heta niha, ji ber bermahiyên şer û teqemeniyan, 11 kes, di nav de 3 zarok hatine kuştin û 18 kes jî birîndar bûne.

**Navenda Nûçeyan**



Ji ber nepeydabûna operasyonên berfireh ên paqijkirina mayînan li gund, bajarok, zeviyên çandiniyê û deverên niştecihbûnê, bermahiyên şer û mayînan li seranserî Sûriyê dibin sedema kuştina sivîlan.

Di nav bûyeran de teqîna mayînan, teqemeniyên neteqiyayî û bermahiyên cebilxaneya komî hebûn, ev yek jî gefên kuştinê yên berdewam li ser jiyana sivîlan, bi taybetî zarok, cotkar, şivan û berhevkarên tiştên xerabe nîşan didin. Rewangeha Sûriyê ya Mafê mirovan rapor derbarê heman mijarê belav kir û tê de zaniyarî wiha bi bîr xistiye:

-Li herêmên di bin kontrola hikumetê ya demkî de 10 kes hatin kuştin, ji wan 7 mêr û 3 zarok, herwiha 18 kesên din birîndar bûn ji wan 4 zarok, 2 jin û 12 mêr.

-Di 1'ê Gulanê de zarokekî deh salî dema ku perçeyek teqemeniya neteqiyayî li nêzî kampên Xirbet Eljouz li gundewarê rojavayê Îdlibê, pê dilîst, teqiya û di encamê de hat kuştin.

-Di 1'ê Gulanê de zilamek û kurê xwe li gundê Hac Huseyîn ku li gundewarê rojhilatê Helebê ye, mayînek bermahiyên şer teqiya, ew bi giranî birîndar bûn.

-Di 1'ê Gulanê de ciwanek piştî ku ji ber teqîna mayînek li nêzî gundên Bendava Tişrîn ya girêdayî Minbicê hat kuştin.

-Li gorî çavkaniyan, ciwan dema ku ew li herêmê bû dema ku mayîn teqiya birîndar bû. Ew ji bo dermankirinê birin nuqteyek bijîşkî lê ji ber birînên xwe hat kuştin.

-2'ê Gulanê: Zarokek dema ku li herêma Ebû Heyya ya çola rojavayê Dêra Zorê mayînek teqiya birîndar bû. Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê, zarokek ji ber teqîna mayînek birîndar bû û ji bo dermankirinê birin tesîseke bijîşkî. Hişyarî hîn jî li ser xetera teqemeniyên neteqandî yên li seranserê herêmên çolê belav bûne hene.

-Di 3'ê Gulanê de, du xortên ji gundê El-Xemîsiye ya li rojhilatê Reqayê, ji ber teqîna mayînekê li çola Maadan a li gundewarê rojhilatê Reqayê birîndar bûn. Çavkaniyan ji rewangehê re ragihandin ku teqîn bû sedema qutkirina destên yek ji qurbaniyan, lê yê din birînên giran li ser rûyê wî hebûn. Her du jî ji bo dermankirinê birin nexweşxaneyê.

-Di 4'ê Gulanê de zarokek bi giranî birîndar bû dema ku wî rahiştibû amûreke nenaskirî. Çavkaniyên herêmî ragihandin ku zarok dema li kolanek taxê dilîst ev tişt dît. Ji nişkê ve di destên wî de teqiya û bû sedema birînên giran ku pêdivî bi veguhastina wî ya bo navendeke bijîşkî ji bo dermankirinê hebû.

-Di 4'ê Gulanê de du zarok û dê û bavên wan ji heman malbatê ji ber teqîna bermahiyek şer dema ku ew li bajarê Elbukemal li gundewarê rojhilatê Dêrazorê bûn û amûrên kevnare berhev dikirin, birîndar bûn. Li gorî raporan, teqînê rasterast her çar endamên malbatê birîndar kirin, herwiha ji bo dermankirinê ber bi nexweşxaneyek herêmî ve hatin veguhastin. Metirsî li ser wan hene ku rewşa hin ji wan xirabtir bibe.

-Di 5'ê Gulanê de li herêma Elramûse ya Helebê zarokek ji ber teqîna mayînekê jiyana xwe ji dest da.

-Herwiha di 7'ê Gulanê de li gundê Elhemedat ê li gundewarê Minbicê, zilamek û jina xwe ji ber teqîna mayînekê bi giranî birîndar bûn.

-Di 7'ê Gulanê de li herêma Çiyayê Ebdul Ezîz a li gundewarê Hesekê ciwanek ji ber teqîna mayînekê jiyana xwe ji dest da.

- Di 9'ê Gulanê de ciwanek hat kuştin û du kesên din jî birîndar bûn dema ku ew bi hev re li çolê li nêzîkî bajarokê Buqrus ê li gundewarê rojhilatê Dêrazorê motorsîkletê siwar dibûn, bermahiyek bombeya komî teqiya.

- 9ê Gulanê: Ciwanek ji ber birînên ku dema mayînek şer, bermahiyek şer, teqiya dema ku ew li zeviyên çandiniyê yên herêmê dermanên kêzikan dirijand, lê ketibû, mir. Ew ji bo dermankirinê hatibû veguhastin nexweşxaneyek herêmî.

-Di 10'ê Gulanê du sivîl, yek ji wan zarokek, ji ber teqîna mayînek şer li depoyeke çopê li bajarokê Îbtaa li gundewarê Derayê hatin kuştin û sê kesên din jî bi birînên cûrbecûr birîndar bûn.

-Di 13'ê Gulanê de zilamekî 36 salî dema ku li nêzî gundê Elbuweyr a li herêma Ellecat a li gundewarê bakur û rojhilatê Derayê pez diçêrand, mayînek teqiya, di encamê de bi birînên cûrbecûr birîndar bû.

-Di 13'ê Gulanê de di nav xaniyekî terikandî de li taxa Teb Elcûra ya bajarê Dêrazorê bombeyek teqiya zarokek, ew birîndar bû.

-Di 13'ê Gulanê de li gundê Elhewşan ê li bakurê Reqayê, sivîlek ji ber teqîna mayînekê, hat kuştin.

-Di 15'ê Gulanê de li bajarokê Kefer Kelbîn li gundewarê bakurê Helebê, xortek bi mayînekê jiyana xwe ji dest da, ev bûyerek din e ku gefên berdewam ên li ser jiyana sivîlan li seranserî deverên mezin ên Sûriyê nîşan dide.

# Tirkiyê li hemberî rastiyeke ku sedsal jê direve ye

**Cemîl Xoce**

Ji destpêka "pêvajoya aştiyê" ve, dewleta Tirkiyeyê hewl da ku xwe wekî aliyekî ku li aramiyê û bidawîanîna şer digere, nîşan bide. Lê tiştê ku li ser erdê diqewime, çîrokeke bi tevahî cûda vedibêje. Tirkiye ne bi hişmendiya lêgerîna çareseriyê tevdigere, lê bi hişmendiya kirîna demê tevdigere, li benda kêliya guncaw e ku bi awayekî siyasî û leşkerî hemû tiştên ku ji pirsgirêka Kurd mane ji holê rake.

Tevgera Kurd biryarên dîrokî di dîroka xwe de girtin. Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) xwe fesih kir, têkoşîna çekdarî ya li dijî Tirkiyeyê bi dawî kir, hêz ji nav sînoran vekişand û derbasî qonaxa nû ku divê siyasî û demokratîk be, bû. Ev ne gavên biçûk an taktîkî bûn, lê guhertinên dîrokî yên bêhempa bûn.

Lê Dewleta Tirkiyeyê di berdêla wê de çi pêşkêş kiriye?

Hema hema nr tiştek.

Heta niha, tu qanûnên rastîn nehatine derxistin da ku serkeftina pêvajoyê misoger bike. Rêber Ocalan ku sermûzakerevanê sereke ye, zemîneke guncaw jê re nehatiye amadekirin. Ji bo şervanan tu garantiyên qanûnî nînin. Reformên demokratîk nînin. Di zihniyeta ewlehiyê ya ku sedsalek e Tirkiyeyê bi rêve dibe de tu guhertineke rastîn çênebûye. Dewlet bêyî tu tawîzên siyasî, teslîmbûna tevahî dixwaze. Ew dixwaze ku Kurd pêşî çekên xwe deynin û tenê wê hingê ew ê bifikire ka tiştek bide wan an na. Ev bi zelalî eşkere dike ku Tirkiye vê mijarê ne wekî meseleya gel û mafan, lê tenê wekî meseleyeke ewlehiyê dibîne. Heta niha têgeha Tirkiyeya bêteror bi kar tîne. Ev jî nîşaneya nebûna niyeteke baş a çareseriyê ye.

Tiştê herî xeter ew e ku rayedarên Tirk, her çend îdia dikin ku behsa aştiyê dikin jî, bi zimanê gefan diaxivin. Dezgehên medyayê yên alîgirê hikûmetê di handana xwe ya rojane ya li dijî Kurdan de israr dikin. Karbidestên Tirk her roj daxuyaniyên nakok didin, carinan îdia dikin ku pêvajo pêşve diçe û carinan jî gefên hêza leşkerî dixwin. Ev yek nebûna îradeyeke siyasî ya rastîn ji bo çareseriyê nîşan dide. Devlet Bahçelî bi xwe, yek ji kesayetên neteweperest ên herî radîkal ên Tirkiyeyê, dest bi axaftina li ser pêwîstiya dayîna roleke fermî ji bo Rêber Ocalan di vê pêvajoyê de kiribû. Ev bi tena serê xwe asta krîza ku Dewleta Tirkiyeyê gihaştiyę, eşkere dike. Tirkiye baş dizane ku ew nikare vê pirsgirêkê bi zorê çareser bike, tevî hemû şer, bombebaran, girtîgeh û polîtîkayên ewlehiyê yên ku bi dehsalan berdewam kirine. Lê Erdogan manevrayê didomîne. Ew çareseriyeke demokratîk a rastîn naxwaze, ji ber ku ew dizane ku demokrasî tê wateya bidawîbûna pergala ku li ser bingehê tepeserkirin û kontrola ewlehiyê ye. Ji ber vê yekê, ew hewl dide ku pirsgirêkê bi awayekî bi rêve bibe ku tenê xizmeta berdewamiya desthilatdariya wî bike. Hemû hesabên Erdogan bi paşeroja wî ya siyasî ve girêdayî ne, ne bi paşeroja Tirkiyeyê yan gelê wê. Ew li benda guhertinên herêmî ye, nakokiyên navneteweyî dişopîne û hewl dide ku berî ku gavên cidî bavêje, hevsengiya hêzê ya guherbar bixwîne. Ji ber vê yekê pêvajo tevî hemû pêşketinan cemidî maye. Tevgera Kurd bi zelalî dibêje ku serdema şer bi dawî bûye û divê çareserî demokratîk be. Lê belê, ew di heman demê de red dike ku bikeve nav xefika kevn a Tirkiyeyê ango hemû kaxizan radestî dewletê bike û dûv re li benda sozên ku qet nayên bicîhanîn bimîne. Ezmûna dîrokî ya Kurdan bi Dewleta Tirkiyeyê re tijî xapandin, darbe û peymanên şikestî ye. Bi dehsalan e ku hikûmetên Tirkiyeyê bi eşkereyî behsa aştiyê kirine, di heman demê de bi dizî girtin, bombebaran û kuştinên bêdaraz pêk anîne. Ji ber vê yekê, tevgera Kurd êdî tenê bi gotinan bawer nake; ew gavên qanûnî yên zelal û garantiyên rastîn dixwaze. Rêber Ocalan projeyeke bi temamî cuda ji zihniyeta dewletneteweya Tirk pêşkêş kir. Wî behsa "neteweya demokratîk", jiyana hevbeş û avakirina komareke demokratîk kir ku hemû nasname û çandan nas bike. Di vê navberê de, Dewleta Tirk dîlê zihniyeta înkar û asîmîlasyonê ye ku komar li ser hatiye damezrandin. Pirsgirêka rastîn ne hebûna Kurdan e, lê belê xwezaya rejîma Tirkiyeyê bi xwe ye. Ew rejîmek e ku ji demokrasiyê ditirse, ji ber ku demokrasî dê asta neheqiya ku dewleta nûjen li ser hatiye avakirin eşkere bike. Ji ber vê yekê Tirkiye her daxwazeke Kurdan wekî gefeke ewlehiyê dibîne, her çend ew daxwazeke çandî yan siyasî ya sade be jî.

Îro, tevahiya herêmê diguhere. Şer dîsa nêzîkî Îranê dibe, Sûriye ji bo hemû îhtimalan vekirî dimîne û projeyên navneteweyî li seranserê Rojhilata Navîn ji bo bandorê pêşbaziyê dikin. Di nav van hemûyan de, Tirkiye hewl dide ku bi rêya tevlêbûna şiklî ya "pêvajoya aştiyê", bêyî ku avahiya xwe ya bingehîn biguherîne, xwe biparêze.

Lê ev siyaset dê zêde dom neke. Aştiya rastîn bi heman zihniyeta ku şer afirandiye, nayê avakirin. Dema ku girtîgeh bi siyasetmedar û muxalifan tijî bin, demokrasî nayê nîqaşkirin. Nabe ku ji tevahiya gel were xwestin ku dev ji hemû amûrên xwe yên hêzê berde, di hemwextî ku dewlet bi xwe jî mafên gel ên bingehîn qebûl nake.

Tirkiye îro ne ewqas li aştiyê digere, lê li çareserkirina krîza xwe ya navxweyî digere. Aştiya rastîn cesareteke siyasî hewce dike ku hîn li Tirkiyê pêk nehatiye.

# Sîstema dadweriyê li Rojava

Herêma Rojava şahidiya modelekê dike ku ji sîstemên dadwerî yên kevneşopî cuda ye, ew li ser bingeha edaleta civakî û çareserkirina nakokiyan bi rêya saziyên herêmî ye, ev jî berovajî pêşketinên siyasî û dadwerî yên têkildarî entegrekirina dadweriyê bi hikumeta demkî ya Sûriyê re ye.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Sîstema dadweriyê li Rojava ji sîstemên heyî cuda ye. Sîstemên heyî doz li dadgehên fermî dest pê dikin. Lê sîstema dadweriyê ya Rojava destpêkê xwe dispêre "Komînê" ji ber ew bingeha rêveberiya civakê ye. Komîn roleke dualî dilîze; Dabînkirina xizmetguzarî û reformê, herwiha çareserkirina nakokiyên di navbera niştecihan de, bi awayekî dostane.

### Edaleta civakî

Di vê çarçoveyê de, komîteyên lihevhatinê erkê çareserkirina nakokiyan çi biçûk bin çi mezin, bi wergirtina gilî û gazincan û guhdarîkirina aliyên nakok ên cuda cuda, berî ku pirsgirêk an jî nakokî mezin bibe, bi rêya gelek rûniştinan li hev dikin û dixebitin ku wan çareser bikin. Ev komîte wekî saziyên şêwirmendiyê kar dikin ku hewl didin bigihîjin çareseriyên hevbeş ên ku aliyên nakokî razî dikin
.

### 'Bi rêya komînê pirsgirêk tên çareserkirin'

Girêdayî vê mabetê yek ji hevserokê komînên bajarê Qamişlo, Komîna Şehîd Mustefa Besam Aslan ji Rojnameya me re diyar kir ku ew pirsgirêkên biçûk di nava komînê de çareser dikin û wiha got: "Pirsgirêkên biçûk ên wekî dizî, nakokiyên malbatî, an dozên jinberdanê pirî caran di nav komîna bixwe de, di yek an du rûniştinan de, têne çareserkirin. Ger çareseriyek neyê dîtin, doz ji meclisa taxê re tê şandin, heke li wir jî nakokî çareser nebe, ji dadgehê re tê şandin."

### 'Piştî komînê, meclisa taxê dikeve dewrê ku pirsgirêkan çareser bike'

Besam Aslan di dawiya axaftina xwe de eşkere kir ku komîna Taxa Xerbî çavdêriyê li zêdetirî hezar malan dike û wiha anî ziman: "Komîna li taxa xerbî ya bajarê Qamişlo çavdêriya zêdetirî hezar malan dike. Tevî wê jî di nav salek û nîvekê de, tenê hejmareke sînorkirî ya dozan hatine tomar kirin. Ev yek jî pejirandina berfireh a civakî ya vê modelê nîşan dide, ji ber ku malbat ji bo çareserkirina nakokiyan serî li komînan didin. Komîteya jinan jî di çareserkirina nakokiyên malbatî de, roleke girîng dilîze, ji ber ku piraniya wan bêyî hewce bike ku bigihîjin astên dadwerî yên bilindtir, têne çareser kirin. Eger komîn nikaribe nakokiyê çareser bike, doz ji meclisa taxê re tê şandin."

### 'Dozên jin ji mala jin pê eleqedar dibe'

Di heman mijarê de endamê Meclisa Lihevhatinê li Meclisa taxa Hilêliyê Mihemed Mistefa jî diyar kir ku dozên ku ji bo komînê dijwar in ji wan re têne şandin û wiha bilêv kir: "Dozên ku di komînê de neyên çareserkirin, ji me re tên şandin. Li vir em bi komînê re dixebitin, da ku pirsgirêkê bi awayên din çareser bikin. Lê dozên ku bi jinan ve girêdayî ne, ji mala jinê re têne şandin."

### 'Bi razîkirina aliyên nakok çareserî pêk tê'

Mihemed Mistefa da zanîn ku ew bawer dike sîstema dadweriyê li herêmê serkeftî ye û axaftina xwe wiha qedand: "Sîstema dadweriyê li herêmê serkeftî ye, ji ber ku dadgeh ji bo çareserkirina nakokiyan mudaxele nakin. Gelek pirsgirêk bêyî hewcedariya parêzer û hwd… têne çareser kirin, ev yek dibe alîkar ku evîn çêbibe. Ger nakokî bêyî dadgehan werin çareser kirin, çima em wan bêyî ku meseleyek mezin jê re çêbikin çareser nakin? Em di meclisê de dizanin çîrok hene ku çareseriyek dadgehê jêre hewce dikin, lê em hewl didin ku çareseriyek aştiyane bibînin ku her du aliyan jî razî bikin."



Besam Aslan



Mihemed Mistefa




### Zehmetiyên dadweriyê û rêya entegrasyonê

Li aliyekî din, di çarçoveya pêvajoya entegrasyonê bi hikumeta demkî ya Sûriyê re, di derbarê dadweriyê de di demên dawî de pirsgirêk derketine holê. Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê Mezlûm Ebdî di hevpeyvîneke taybet de jî, ji Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) re destnîşan kir ku nêzîkî du hefte berê pirsgirêk derketine holê, ev yek rasterast bandor li ser pêşveçûna vê pêvajoyê kirine.

Ebdî rave kir ku sedema vê nakokiyê nebûna mekanîzmayeke zelal ji bo entegrekirina dadwerên Rêveberiya Xweser di sîstema dadwerî ya hikumetê de ye, ji bilî fikarên têkildarî misogerkirina mafên wan û parastina taybetmendiyên herêmê. Herwiha wî berteka dadweran a redkirina paşguhkirinê wekî mafdar dît, ji ber ku ew li dijî prensîba lihevkirinê bû ya ku entegrasyon li ser wê were avakirin.

Ji bo derbaskirina vê krîzê jî, rêze civîn li Şamê hatin lidarxistin. Têgihîştin hatin bidestxistin ku tê de qebûlkirina entegrasyona dadwerên ji Rêveberiya Xweser, digel berdewamiya xizmeta hin dadwerên ji qonaxa berê ji bo misogerkirina berdewamiya xizmetên dadwerî hebûn. Herwiha lîsteyên navên dadwerên Rêveberiya Xweser hatin amadekirin, da ku ew beşdarî dewreyên perwerdehiyê yên fermî bibin û di dadgehan de werin tayînkirin. Di heman demê de tekezî li ser pêwîstiya lezandina vekirina navendên dadwerî hatin kirin, ji ber girêdana wan bi xizmetên bingehîn ên wekî hilbijartin û derxistina belgeyên fermî, heye.

### Nîqaşa li ser ziman û nasnameya dadwerî

Yek ji mijarên herî berbiçav ku bû sedema nîqaşeke giştî, rakirina zimanê Kurdî ji tabelaya Koşka Edaletê ya li Hesekê bû, hikumetê vê yekê bi gotina ku sazî serwer e û divê tenê zimanê Erebî bikar bîne, rewa kir. Berevajî vê, gelê Kurd bi taybetî ciwanan, redkirina xwe ya li hember vê biryarê nîşan dan û ew wekî destdirêjî li ser nasnameya wan a çandî û zimanî dîtin. Di encamê de, li hev kirin ku li bajarên ku piraniya niştecihên wan Kurd in, wek Kobanî, Qamişlo, Amûdê û Dirbêsiyê, tabelayên hem Erebî û hem jî Kurdî werin danîn, rewşa li Hesekê jî, dê paşê were nirxandin.

Mezlûm Ebdî tekez kir ku xwepêşandanên gel hesasiyeteke rastîn a li hember pirsgirêka zimanê Kurdî nîşan didin, lewra wî tekezî li ser girîngiya aramkirina rewşê û veguherandina têgihîştinên siyasî di pratîkê de kir, bêyî ku pêvajoya entegrasyonê têk biçe.

Di dawiyê de dikare were gotin ku sîstema dadweriyê li Rojava ezmûnek bêhempa nîşan dide ku li ser bingeha beşdariya civakê û çareserkirina aştiyane ya nakokiyan e, di demekê de ku ev ezmûn di çarçoveya entegrasyonê de bi hikumeta demkî ya Sûriyê re bi pirsgirêkên siyasî û qanûnî yên tevlihev re rû bi rû ye. Her çend hewldanên ji bo gihîştina çareseriyên lihevkirî berdewam dikin jî, hevsengiya di navbera taybetmendiyên herêmî û pêdiviyên dewleta navendî de, di pêşeroja vê pirsgirêkê de faktorek girîng dimîne.

## Hunermend jî daxilî orkestraya reşkirinê bûn



**Farûk Sakik**

Di van demê dawî de êrişên li dijî tevgera azadiya Kurdistanê reng û rêbazên xwe de guhertin çêkir. Lê êrişên wan bê navber dewam dikin.

Her tişt piştî biryarên kongreya PKK'ê ya 12'emîn dest pê kirin. Kongre wan biryarên dîrokî çima da? Digotin di Kurdan de rihê netewetiyê hatî afirandin. Asîmîlasyon hatî seknandin û nasname û hebûna Kurdan hatî mîsogerkirin. Lê ji bo texrîbatên di Kurd û Kurdistan de hatine çêkirin werin dermankirin-azad kirin îro şûnde bi rêbazên siyaseta demokratîk têkoşînek were meşandin.

Li navendek ji bo ku wan destkeftiyên bi saya tevgera azadiyê bi dest ketine werin ruxandin, hin hewldan hene. Siyasetek reşkirinê ya taybet tê meşandin. Dewleta Tirkiyê jî di vê pêvajoya aştî û civaka demokratîk de siyasetek wiha dimeşîne. Lê veşartî. Dixwazin hem di nav civaka Tirkiyê de û bi taybet jî di nav civaka Kurdan de her wek tevgera azadî hîç tiştek bi dest nexistiye pêvajoyek dane destpêkirin. Ev hewldanên wan bi taybet di nav civaka Kurdan de belavdikin.

Ji şerê Rojava destpêkirin û hetanî roja me didin dewam kirin. Hin şexsiyetên di nav civakê de tên naskirin xistinin dewrê û di medya dijîtal de jehra xwe belavdikin.

Piştî ku ev pêngav dest pê kir û aliyên Kurdan li gor nexşeriya Rêber Apo û rihê pêngavê tevgeriyan, diviya dewlet jî hin gav bavêta . Mixabin. Dewletê rojek wê gav bavêje wê li gor rihê muzekereyan tevbigere, lê anha li du ye ku civakê bi plana ku tevgera azadiyê hîç tuştek nekiriye bide îknakirin. Bahçelî wa dîsa wek herdem nexşerêyek dirêj bi raya giştî re parvekir. Ev nexşerê jî dema ku dîtin dikarin vê tevgerê reş bikinwê bixin meriyetê. Herî dawî hunermendê Kurdan jî xistin parçeyek van hewldanên xwe.

Hin hunermend di dema ku di sala 2015'an de li dijî Kurdan şer dane destpêkirin, Kurd û Kurdistan dibin bahozan de derbasbû, derketin pêş.

Di wê bahozê de, gelek hunermend jî wek siyasetmedarên kurdan derketibûn derveyî welat û yên li derveyî welat bûn jî nikaribûn vegerin welat. Meydan ji hin kesan re mabû. Li gor dilê xwe hespê xwe dibezandin û li ser mîrasê yên li derva digevizîn. Ev salek û nîve bi pêvajoya nû re hin aramî çêbû û xwediyên qada vegeriyan li welat hunera xwe pêşkêş kirin.

Li gelek mîhrîcan û konseran de hunermendê rojên bahozan nehatin tercîh kirin, civak li dora 'xwediyên qadan' yên esas civiyan. Bi sedhezaran kes tevlî konserên wan dibûn. Dawî li rojên wan yên şatafat danîn. Di demek waha de bi hêsanî bûn parçeyek siyaseta reşkirina tevgera azadiyê.

Ev hunermend jî ji aliyê xwe de êrişî saziyên çand û hunera Kurdan kirin. Saziyên ku bi kedên mezin hatibûn avakirin, ji muzîka Kurdî re xizmetên salan kiribûn, dixwestin kirmînal û heqxûr nîşanbidin.

Dema ku van kesan derbasî platform dijîtal yên reşkirinê bûn, hin kes li wan platform li benda wan bûn. Azmûnên xwe yên reşkirina tevgera azadiyê bi van hunermendare parvekirin û pêşengtî jî kirin. Lê bersiva herî mezin ji aliyê hunermend Şivan Perwer ve hat dayin. (Em dubare nekin ku herkesî guhdar û temaşe kiriye.)

Ew dizanin kesên ku wan bi vî sûcî, wan derxe hemberî dayikên şehîdan ku tufkin serçavê wan tuneye. Lê dîrok rojek wan bîne ber lingê van dayikan ku efûyê bixwazin.

Şert merc çidibûn bila bibin, wê bi sernekevin. Ji xwe dîrok şahidî kirî ku vê tevgerê doza Kurdan derbasî platformên cîhanê kiriye.



# Li Rojavayê Kurdistanê şano qadeke parastina nasnameya çandî ye

Şano li Rojavayê Kurdistanê di qada civakî û çandî de xwedî roleke berbiçav e, tevî hemû zehmetiyan ew di parastina nasnameya çandî, nîşandana rastiyan û xurtkirina hevgirtina pêkhateyan de xwedî bandor bû.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Şano yek ji şêweyên hunerî yên herî berbiçav e ji bo derbirîna fikar û armancên civakê, ew ne tenê amûrek şahiyê ye, lê belê platformek çandî û rewşenbîrî ye ku rastiya mirovan û pirsgirêkên wan nîşan dide. Li Rojava, şano di salên dawî de girîngiyek mezin bi dest xistiye û bûye beşek yekgirtî ya tevgereke çandî ya ku ji bo parastina nasnameyê û pêşxistina hişmendiya civakî hatiye veqetandin.

Di çend salên borî de, herêmên Rojava şahidê çalakiyên çandî yên berbiçav bûne, ku tê de şano roleke girîng û bibandor lîstiye, bi rastî, ew bûye navgînek ji bo îfadekirina rastiyên civakî, siyasî û mirovî yên ku gel pê re rû bi rû dimîne. Her ku eleqeya bi hunerê re zêde bûye, komên şanoyê dest bi organîzekirina performansên cihêreng kirine ku beşên cûda yên civakê hedef digirin û peyamên perwerdehî û çandî yên ku fikar û daxwazên gel nîşan didin, radigihînin. Şano bûye beşek yekgirtî ji jiyana çandî ya herêmê, bi taybetî di ronahiya şert û mercên dijwar ên ku Rojava di salên dawî de derbas kiriye, ji ber ku hunerê roleke girîng di pêşxistina giyanê hêvî û berxwedanê di nav civakê de lîstiye.



### Şano li Rojava: Tevî zehmetiyan xwedî hebûneke mezin e

Berhemên şanoyê li Rojava gelek pirsgirêkên civakî û mirovî çareser kirine, wek bandorên şer, koçberî, xizanî, perwerde, mafên jinan û jiyana hevbeş di navbera civakên cihêreng de. Şanogeran bi şêwazek hunerî ya ku li ser rastiyê hatiye avakirin, van pirsgirêkan bi serkeftî ji temaşevanan re pêşkêş kirine, bi vî rengî eleqeyek berfireh bi performansan re pêş xistine. Şano xwedî qidretek bêhempa ye ku bandorek rasterast li ser mirovan bike, ji ber ku ew xwe dispêre performansa zindî û têkiliya rasterast bi temaşevanan re, taybetmendiyek ku wê ji hin medyayên çandî yên din bandortir dike.

Şano bi pêşkêşkirina performansên bi zimanên Kurdî, Erebî û Suryanî, her wiha bi tevlîkirina mîrata gelêrî û çîrokên herêmî di berhemên şanoyê de, di parastina nasnameya çandî ya gelên herêmê de roleke girîng lîst. Ev pirrengiya zimanî û çandî alîkarî kiriye ku têgihîştin û nêzîkbûna di navbera pêkhateyên cihêreng ên civakî de pêş bikeve, di heman demê de ji raya giştî re derfetek peyda kiriye ku bi çandên cûda yên ku di heman civakê de dijîn re hevnas bibin.

### Rola jin û ciwanan di tevgera Şanoyê de

Jinan di qada şanoyê ya Rojava de hebûnek cûda ava kirine, çi di lîstikvaniyê de, çi di derhêneriyê de, çi jî di nivîsandina şanoyan de. Beşdarbûna wan beşdarî hilberîna berhemên ku li ser pirsgirêk, mafên jinan û rolên civakî ne bûye, bi vî awayî alîkarîya hilweşandina gelek astengiyên civakî yên kevneşopî kiriye. Şanoyê ji jinan re cihek peyda kiriye ku raman û jêhatiyên xwe bi azadî îfade bikin, di heman demê de wekî wesîlek xizmet kiriye ku dengê xwe bi rêya medyayek bihêz û hunerî bigihînin civakê.

Di heman demê de Şano ji bo gelek ciwanan bûye cihekî geştyarî, ku wan tê de derfetek dîtine ku jêhatiyên xwe nîşan bidin û şiyanên xwe yên hunerî û çandî pêş bixin. Komên şanoyê ji bo perwerdekirina ciwanan di warê lîstikvanî û nivîsandina şanoyan de dixebitin, hewldanên ku beşdarî derketina nifşek nû ya hunermendên ku bi hunerên şanoyê re girêdayî ne bûne. Şano ne tenê bi şahiyê ve sînordar e, berevajî vê ew alîkariya ciwanan dike ku baweriya xwe bi xwe, jêhatiyên ragihandinê û şiyana xebata bi bandor wekî tîmek pêşve bibin.

### Rola Şano di warê çandî û civakî de

Di salên dawî de, Rojava şahidiya pêşwazî kirina hejmarek festîval û çalakiyên şanoyê kiriye, ku tê de beşdariya komên cihêreng ên herêmî hene ku performansên li ser pirsgirêkên cûrbecûr ên civakî û mirovî pêşkêş kirin. Van festîvalan ji bilî xurtkirina têkiliyên di navbera hunermend û raya giştî de û çandina atmosferek têkiliya çandî di nav civakê de, beşdarî vejandina qada çandî û pêşxistina jêhatiyên ciwan bûne.

Rola şanoyê ne tenê bi pêşkêşkirina performansên hunerî ve sînordar e, berevajî vê, ew wekî peyamek mirovî ya ku ji bo aştî û jiyana hevbeş parêzvaniyê dike, berfireh dibe. Hunermend piştrast dikin ku şanoyê bi pêşkêşkirina berhemên ku hêviyê diçînin û girêdanek domdar bi jiyanê re teşwîq dikin, alîkariya sivikkirina bandora psîkolojîk a şer û krîzan kiriye. Wekî din, şano beşdarî pêşxistina hişmendiya civakî û çandî dibe û derfetek pêşkêşî mirovan dike ku li ser pirsgirêkên ku bandorê li jiyana wan a rojane dikin bifikirin û nîqaş bikin.

Li Rojava, şano hîn jî şêweyekî hunerî ye ku peyamek çandî û mirovî ya girîng hildigire, fikar û hêviyên civakê nîşan dide di heman demê de beşdarî pêşxistina hişmendiyê û parastina nasnameya çandî dibe. Tevî dijwarîyên ku kesên di vî warî de dixebitin pê re rû bi rû dimînin, pratîkeya şanoyê di hewildanên xwe de berdewam in da ku vê şêweyê hunerî pêş bixin û hebûna wê wekî platformek azad ji bo derbirînê, afirîneriyê û pêşkeftina mirovan misoger bikin.

# Wênesaza ku tabloyên jinan saz dike

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Wênesaz Leyla meriyî ku ji biçûkaniya xwe ve hezkirina wênesaziyê di dilê wê de şax daye, bi hest, raman û xeyalên xwe tabloyên jinan xêz dike.**

Hunera wênesaziyê hunera derbirîna hest, raman û xeyalan e ku mirov bi riya wê hestên xwe derdixe. Yek ji wan wênesazên jin ku tabloyên jinan xêzdike; Leyla meriyî ye. Leyla ji biçûkaniya xwe ve li gundê Fayic yê girêdayî Til Berek dest bi wênesaziyê kiriye û heya ku temenê wê bûye 22' sal jî wênesaziya xwe berdewam kiriye.

### Jiyana Leyla ya wênesaziyê

Leyla wênesazeke ku bi temenê xwe 22' salî ye. Leyla di fistîvala Bûharê ya zanîngeha Rojava de bi du tabloyên xwe tevlî bû. Tevî ku ew zewicî ye jî, lê wê hevjînê xwe û kurê xwe li Kurdistanê hêla ye û daketiye Rojavayê Kurdistanê da ku hem xwendina xwe bidawî bike û hem jî tevlî fistîvala Buharê bibe û wênesaziya xwe vejîn bike. Leyla di wênesaziyê de gelekî jêhatî ye ku ji bûçûkaniya xwe ve û bi temenê xwe yê biçûk xwe fêrî wêneyan dikir. Ew di biçûkaniya xwe de li gundê Fayic yê girêdayî Til Berek jiyan dikir. Leyla li gundê xwe dest bi wênesaziyê kir heya ku mezin bû. Ji ber wênesazî kêfxweşiya jiyana wê bû. Ew bi riya wênesaziyê bi pêş ket ji ber wê wênesazî parçeyek ji xwe didît. Leyla ji ber hizkirina wê ji wênesaziyê re wê destpêkê li gund bi komiran li ser dîwaran xêz dikir, ji ber di wê demê de gelekî nizanibû ku wêneyan saz bike lê tişta ku diket serê wê xêz dikir. Leyla her ku mezin dibû bêtir bi wênesaziyê ve dihate girêdan û bêtir fêr dibû. Leyla ne tenê dixwest wênesaziyê bike, lê belê bi wênesaziyê re jî dixwest ku xwendina xwe jî bidawî bike. Lê dema ku mezin bû û bêtir fêrî wêneyan bû êdî xwe tevlî pêşengeh û fistîvalan kir.

Leyla tevlî gelek pêşengehên bajarê Qamişlo yên weke pêşengehên bi navê fistîvala jinê ya 9'emîn, pêşengeha Yekpar û ya tîma Artistî de ku kar dikir bi riya wê tevlî gelek pêşengehan bûye. Lê dema ku bi wêneyên xwe yên xweşik tevlî pêşengehan dibû ya herî zêde di pêşengehê de wêneyên wê balkêş bûn. Ji ber bi hemû hêza xwe wêne çêdikirin da ku bala her kesî bikşîne. Ew wêneyên xwe herî zêde bi madeyên rûn çêdike.

### Xêzkirina tabloyên jinan

Leyla ev bû mihek ku ji başûrê Kurdistanê daketiye da ku xwendina xwe ya beşê "Îdariya Malî" sala dawî bixwîne û bi dawî bike. Ew li başûrê Kurdistanê ji ber rewşa wê zehmet bû tevlî tu pêşengehan nedibû lê tevî wê jî wê di mal de wênesaziya xwe berdewam dikir. Leyla wêneyan bi giştî çêdike, lê bi tayîbet li ser jina ne, ji ber ew wek jinekê û dayikekê tenê dixwaze li ser jinan saz bike. Ji ber Leyla didît ku çawa heya niha hîna ew tundî li ser jinê tê kirin, ji ber wê di van aliyan de bêtirî wêneyên xwe li ser jinê çêdikirin.



Wêne ji Leyla re xwedî wateyeke pir kûr û girînge. Ji ber dema ku Leyla bi hestekî dihise bi riya wî hestê xwe wêneyan saz dike. Wêne li ba Leyla ne tenê gotineke lê ew wêneyê tiştekî mezin dibîne. Leyla dixwaze ku her kes ne tenê bi xwendin û karê xwe ve mijûl bibin, lê daxwaza wê ji hemû miletî re ew e ku xwe fêrî wênesaziyê jî bikin ji ber li ba Leyla wênesazî weke tiştekî pir girînge di pêşketina jiyana wê de.

# Ji ber barana zêde zeviyên kemûnê zerarên mezin dîtin

Cotkarê bi navê Ebdulhelîm Reşik ku berhema kemûnê çandiye diyar kir ku ji ber barana zêde û piştre germahî, di nav zeviyên kemûnê de nexweşî belav bûn û got, "Zeviyên kemûnê zerarên pir mezin dîtin."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di nava berhemên çandiniyê yên bêhnxweş û dermanan de çandina berhema kemûnê pirojeyeke pir xeter û hesas e. Serkeftina wê jî bi rewşên avhewayî girêdayî ye. Barana zêde ya ku îsal bariya hêviya cotkaran ji nû ve çêkir, lê ji ber germbûn û şilbûna zêde ya ku piştî baranê rû da, hişt ku gelek neweşî di nava piraniya zeviyên cotkaran de derkeve.

Îsal zeviyên berhemên derman û bêhnxweş li hemberî zehmetiyên mezin rû bi rû man, tevî demsala bi barane jî, lê hin zehmetî derketin holê, wekî derketina nexweşiyên ji ber şilbûna zêde û germahiya kêm, bi taybetî li hin zeviyên kemûnê, lewma guherînên avhewayê bû sedema rîskê ya domdar, ku di salên berê de ji bo cotkaran bûye sedema windahiyan, bi taybet bi destpêkirina bahozên teyrokê re, ku li hin deveran, bi taybetî li Amûdê û Derbasiyê, zirar da berhemên kemûnê.

Li gorî agahiyên ku ji Komîteya Aborî, Çandinî û Ajaldariyê ya Cizîrê hatine wergirtin, qada avdanê ya ji bo çandina berhemên dermanî û bêhnxweş li herêma Cizîrê ji bo demsala çandiniyê ya 2025/2026`an gihaştiye nêzîkî 87 hezar û 96 donim.



**Qûnaxên çandina kemûnê**

Çandina Kemûnê bi çend qûnaxên hesas derbas dibe, ku ji proseya tovkirinê destpê dike, çi di destpêka Sibatê de ji bo berhemên ku bi baranê têne avdan an di cotmehê de ji bo berhemên têne avdan, piştre qûnaxa "Efesh" e, ew jî paqijkirina zeviyan e, rakirina nebatên xeter an ceh û genimên ku di nava berhema Kemûnê de çêdibe, ku bandorê li ser hilberîna wê dike.

Li gorî cotkaran derdora 90 rojî ji bo mezinbûna berheman pêwîste, di vê demê de derdora 40 roj tov di bin erdê de dimîne berî ku mezin bibe, herwiha 50 rojên din hewce dike da ku ji bo çinînê amade be. Di qûnaxa çinînê de, berhem bi destan tê çinîn, piştre tê hiştin da ku hişk bibe berî ku bi alavên taybetî dabeşkirinê bên ji hev veqetandin, ev prose ked û demeke dirjê divê, lê di heman demê de ji bo parastina kalîteya zeviyan pêwîste.

Gelek cotkar li erdên ku bi salan nehatiye çandin, Kemûnê biçînin da ku ji nexweşiyan dûr bikevin û hilberîneke bilindtir misoger bikin.

**Cotkarên kemûnê bi windahiyekê rû bi rû mane**

Li gundê Topo yê girêdayî bajarê Amûdê, cotkarê bi navê Ebdulhelîm Reşik îsal 130 donim berheman Kemûnê çandiye, ji me re behsa zehmetiyên ku tê re derbas bûn û demsala Kemûna Îsal kir û wiha anî ziman: "Tevî baran baş a îsal ku bariya, lê çandinî ne bi awayekî baş e. Di destpêka çandina berhema Kemûnê de, ji ber baranê me nikarîbû biçînin, ji ber vê yekê em dereng man da me Kemûna xwe çand herwiha Kemûn jî dereng ma heya ku mezin bû. Ji ber barîna teyrokan gelek zirar gihaşt zeviyên me, cara yekemîn dema ku teyrok bariya bi rêjeya ji sedî 75 zirar gihat berhemê, piştre me derman kir lê bi barîna teyroka cara dûyemîn zeviyên min ji holê rakir, yê mabû jî winda bû ji ber guhertina avhewayê. Niha jî ez li bendê deraseyanim da ku erd bê ajotin. Yê ku Kemûna wî hebe ji niha û 10 rojên din eger rewşa avhewayê dîsa neyê guhertin wê cotkarên ku erdên wan zirar neghaştinê dest bi çînîê bikin."

Ebdulhelîm Reşik tekez kir ku çandiniya îsal bi zehmetî derbas bû ne tenê ji bo Kemûnê lê hemû berhemên çandiniyê yên din jî.

**Zehmetiyên cotkaran**

Cotkar Ebdulhelîm Reşik behsa zehmetiyên ku di warê çandiniyê de derdikeve û wiha got: "Gubre li gorî sala borî buha bû her tonek ji 750 heya 800 dolarî bû, sala çûyî bi 400 heya 450 dolarî bû, baran pir bû û hewceya zeviyan bi semadê hebû, lê ji ber buhabûnê gelek cotkar îmkanên wan tune bû ku bikrin û zeviyên xwe semad bikin, cûreyên semadê hebûm Çînî, Îrarî, Rûsî û ya Sûrî jî hebû lê hemû buha bûn. Mazota ji bo derasyan nehatibû diyar kirin û nedihat peyda kirin, heya niha rêvebriya sotemeniyê carekê tenê mazot belav kiriye. Ji xwe mazota terektoran ev du salin mazot nayê dayîn ji bo wan. Bi awayekî giştî wekî ku em dibînin piştgî ji bo çandiniyê tune ye, em bi hêvî ku li ser vê yekê bê sekinandin"

**Nexweşiyên ku di nava zeviyan de derket**

Li gorî Ebdulhelîm Reşik gelek nexweşî di nava zeveiyan derket, û wiha diyar kir: "Nexweşiya fungî ji ber şilbûn û barana zêde derket, piştre zingariya pelan derket, hin cotkaran derman kirin lê ji ber belavbûna wê cotkaran dev ji dermankirinê berdan. Di heman demê de jî kurmê pelan li gelek zeviyan derket."

**Kemûn berhemeke pir hesas û xeter e**

Kemûn berhemek e ku şert û mercên avhewayê yên baş hewce dike, ji ber vê yekê di her rewşeke guhertina avhewayê de, ew li hemberî windahiyeke mezin tê. Kemûn bi awayekî mezin bi hişkesaliyê bandor dibe, herwiha qeşa û barîna teyrokan dikare berhemê ji holê rake. Wekî din bayên bihêz di hin qonaxên mezinbûnê de jî dibin sedema kêmbûna hilberîna berhemê.

Ji ber hesasbûna Kemûnê cotkar her dem dudilî ne ka biçînin an na. ji aliyekî din ve serkeftina wê di hin demsalan vebijêrkek balkêşe, bi taybet bi kêmbûna lêçûnên wê li gorî berhemên din. Pêşeroja vê berhemê bi du faktorên sereke ve girêdayî ye: şert û mercên avhewayê yên aram û hebûna kanalên kirîn û frotinê yên bi bandor, ku dê kêmkirina xetereyan û zêdebûna şiyana aborî ji bo cotkarên misoger bike.

# Barana îsal pêşerojeke serkeftî da demsala çandiniyê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Cotkarê bi navê Osman Xidir Salih geşbîniya xwe anî ziman li ser serkeftina demsala çandiniya îsal û hêvî kir ku demsal bi heman serkeftinê heta çinînê bidawî bibe.**

Demsala çandiniya îsal bi saya barîna rêjeyeyên mezin ji baranê li gorî salên borî, hişt ku xurtkirineke balkêş di helberîna çandiniyê de çêbibe, nemaze başkirina rastiya avê û çandiniyê li hemû deverên Rojava. Di heman demê de bi awayekî zelal demsala çandiniyê ji ber barana zêde ya ji destpêka sale ve biserkeftî hate dîtin, ji bilî çandiniyên dermanî û bêhnxweş ku ji ber bahozên baran û zîpkê gelek zirar gihand zeviyên cotkaran û bû sedema windahiyeke mezin li hin deveran.



**Demsal bi avhewayeke guncav derbas bû**

Demsala 2026'an bi şert û mercên avhewayî yên guncav derbas bû, herwiha vê yekê bandoreke erênî li ser rastiya çadniniyê nîşan da, ji ber ku barana zêde ya ku bariya hişt ku berdariya axê baş bike û çavkaniyên avê xurt bike. Wekî din piştgiriyek mezin da beşê Sewalkariyê di rêya dabînkirina çavkaniyê avê yên têrker.

Ji xwe wekî me anî ziman, tevî van erêniyan jî gelek dever û zevî bi bahozên baran û teyrokan rû bi rû man, hişt ku hin zevî bi temamî û hin jî bi awayekî beşan zirarê bibînin, bi taybet çandiniyên dermanî û bêhnxweş wekî Kemûn û Kizbera.

**Gerên çavdêriyê hatin kirin**

Rêveberiya Çandiniyê ji destpêka demsala 2026'an hemû tedbîrên pêwsît ji bo serkeftina çandiniyê girt, lewma gelek gerên meydanî ji bo şopandina rastiya zeviyên pêk anîn, bi taybet zeviyên genim û ceh, bi armanca keşfkirina zû li ser nexweşiyan.

**Cotkar geşbîniya xwe nîşan da**

Barana zêde ya îsal şilbûna axê baştir kiriye û deopkirina avê di erdê zêde kiriye, ev yek jî piştgirî daye gihandina berhemên bingehîn, ji bilî başkirina şînatiyan bi giştî.

Derbarê vê mijarê de cotkarê bi navê Osman Xidir Salih ku ji Ebû Xeşebe û niha zeviyekî li gundewarê Tirbespiyê birêve dibe ji rojnameya me re tekez kir ku rewşa çandiniya îsal pir baş e û wiha anî ziman: "Demsala 2026'an bi saya barîna baranê serkeftî bû, em hêvî dikin ku demsal bi heman serkeftinê, heta çinînê biqede."

**'Cudahiyek pir mezin li gorî sala borî heye'**

Osman Xidir Salih destnîşan kir ku li gorî sala borî cudahiyeke pir mezin di navbera her du demsalan de heye û got: "Sala borî me çar caran zevî av da lê tu encam nehat girtin û demsal binketî derbas bû, lê îsal tenê bi barîna baranê bêyî ku rêyên avdanî bikarbînin demsal pir baş e. Ji ber guhertina avhewayê me hinek astengî dîtin, lê niha rewş başe, hêviya me heya dema çinînê rewş wiha be, da ku zirar neghêje zeviyan."

Li Rojava îsal li gorî sala borî, demsalek çandiniyê ya berbiçav derbas bûye. Barana ku bi rêjeyek mezin bariye beşdarî serkeftina hilberîna çandiniyê bû û zeviyên cotkaran parast ye.

**Berfirehbûna qadên çandiniyê**

Sektora çandiniyê di deverên ku çandinî lê hatiye kirin berfirehbûnek tomar kiriye, ku hejmara destûrên çandiniyê ji 23 hezar derbas bûye. Erdê avî gihaştiye nêzîkî 2 milyon û 77 hezar donimî, herwiha erdê ku bi baranê tê avdan ji 3 milyon û 250 hezar donimî derbas bûye.



# Meclisa gel e, yan a desthilatdariyê ye?

Parlamentoya Sûriyê di dîrokê de gelek qonax derbas kiriye, lê di dema rêjîma Baasê de saziyek sembolîk bû ku di bin kontrola dewletê de dixebitî. Piştî hilweşîna rejîmê, niha Sûriya nû li benda avakirina mecliseke demokratîk e ku nûnertiya hemû pêkhateyan temsîl bike û mafê wan biparêze. Lê paşguhkirina gel û sînordarkirina kursiyan, nayê qebûlkirin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Parlamentoya Sûriyê cara yekem di sala 1919' an de bi navê "Kongreya Giştî ya Sûriyê" hate damezrandin. Ji wê demê ve, desthilata yasadanînê di gelek qonaxan re derbas bûye, ya herî berbiçav "Konseya Parlamentoyê" di serdema serxwebûnê de, "Meclisa Damezrîner" di sala 1928'an de û heta "Meclisa Gel" ku di sala 1971'an de hate damezrandin. Herwiha vê yekê dawiyê guhertinek radîkal di avahiya xwe de dît, da ku bikeve qonaxek veguhêz.

**Meclisa Gel a Sûriyê**

Meclisa Gelê Sûriyê ji sala 1971'an vir ve, di dema desthilatdariya Partiya Baasê de, dezgeha yasadanînê ya Komara Erebî ya Sûriyê bû. Ew ji 250 endaman pêk dihat ku ji 15 navçeyên pir-endamî ji bo çar salan dihatin hilbijartin. Meclisa Gel li gorî destûra bingehîn a 2012'an desthilata yasadanînê temsîl dikir, her çend serokê komarê bi rêya derxistina fermanên yasadanînê desthilat parve dikir. Piştî hilweşîna rejîma Eseed, di 29'ê Çileya 2025'an de, rûniştina duyemîn a Meclisa Gel hate hilweşandin û destûr hate sekinandin.

**Meclisa gel xwedî biryarên desthilatdariyê ye**

Meclis xwediyê gelek desthilatan e, di nav wan de pejirandina budceya giştî, ragihandina şer û aştiyê, pejirandina peymanên navneteweyî. Herwiha desthilata wê li ser çavdêriya hikumetê heye ku dihêle ew wezîran bipirse û baweriyê ji wezîran an tevahiya hikumetê bikşîne. Şaxa yasadanînê sê caran rola desthilata damezrîner girtiye ser xwe, da ku destûra bingehîn a welêt amade bike. Lê belê, destûrên 1973 û 2012'an ji hêla komîteyên ku ji hêla şaxa cîbicîkar ve hatine damezrandin ve hatine amadekirin. Ji xwe parlamento xwediyê desthilata guhertina destûrê ye jî. Meclisa Gel li gorî destûrê, bi rêya dengdana gerdûnî, veşartî û rasterast di yek gerê de, ji bo demek 4 salan tê hilbijartin, ew jî li gorî piraniya kêm li herêmeke mezintir, ango parêzgehê, li gorî pergala hilbijartinê ya 1973'an. Ji hilbijartinên 2012'an vir ve, beşdariya pir-partî di destûr de hate dayîn. Lê berê, ji sala 1973'an vir ve, ev hilbijartin bi Eniya Pêşverû ya Neteweyî ve sînordar bûn. Tevî vê yekê, encamên hilbijartinê ji damezrandina Meclisa Gel ve bi girîngî neguheriye, partiya Baas a Sosyalîst a Ereb bi berdewamî piraniya mutleq a kursiyan digirt, Eniya Pêşverû ya Neteweyî ji duşêyan zêdetir kursiyan misoger dikir û sêyeka mayî jî, ji serbixweyan re dihat veqetandin.



**Kursiyên herî kêm ên Meclisa Gel ji karker û cotkaran re**

Navenda Meclisa Gel li paytext Şamê ye, ev kevneşopiyeke ku vedigere sala 1932'an. Her çend destûra bingehîn a Sûriyê hejmara endaman qet diyar nekiriye jî, ev yek bi fermanekê ji serok re dihat hiştin. Ji hilbijartinên 1990'an vir ve hejmar li 250 kursiyan pêk dihat, herî kêm nîvê wan karker û cotkar bû, wekî ku di destûrê de hatiye destnîşankirin. Ev bend ji destûra bingehîn a Misrê ya di dema di bin serokatiya Cemal Abdel Nasir de hatiye wergirtin, wekî navê ku ji şaxa yasadanînê re hatiye dayîn jî.

Li gorî guhertinên destûrî yên 2012'an, Meclisa Gel ji bo heyamek salekê serok, cîgirê serokê meclisê û du sekreteran hildibijêre. Hilbijartina jî ji nû ve her sal di meha Cotmehê de pêk dihat. Destûr her wiha destnîşan dike ku Meclisa Gel salane sê civînan li dar dixe, her yek ji wan herî kêm şeş mehan dom dike, dema ku pêwîst be jî li ser daxwaza serokkomar, îhtîmala lidarxistina civînek awarte heye.

Parlamento ji damezrandina xwe heta sala 1963'an wekî saziya herî bi hêz a welêt dihat hesibandin, ji ber ku têkiliyek aloz di navbera serokên wê û fermandarên artêşê de hebû, nemaze piştî destpêkirina partîzanîyê di navbera efseran de di navbera salên 1949 heta 1954'an de û di rêjeyek kêmtir de di navbera salên 1954 û 1963'an de. Hemû serokkomarên welêt ên ku paşxaneya leşkerî tunebû, ji paşxaneya parlamentoyê bûn, heman tişt ji bo serokwezîran jî derbas bû.

**Meclis di bin kontrola dewletê de**

Her çiqasî em behsa Meclisa Gel bikin bi rojan em li ser bidawî nakin, lê divê were zanîn ku di dema rejîma Baasê de, li Sûriyê meclisên gel di bin kontrola dewletê de bûn û tenê wekî saziyeke sembolîk dixebitin. Meclisê tu carî desthilateke rasteqîn a birêvebirinê tune bû. Hemû biryarên girîng ji aliyê serokkomar, partiya Baasê û dezgehên ewlehiyê (îstixbaratê) ve dihatin girtin. Hilbijartinên meclisê ji aliyê rejîmê ve dihatin organîzekirin û pêşwext diyar bûn. Namzet bi awayekî tund ji aliyê partiyê ve dihatin kontrolkirin û pejirandin. Saziyên wekî meclisên gel ên serbixwe an rêveberiyên xweser ên herêmî qet tune bûn. Mafên siyasî û çandî yên gelê Kurd û pêkhateyên din dihatin înkarkirin. Sîstema kar û xebatên meclisê di dema Baasê de bi temamî li ser bingeha navendîbûna tund, fermanên serdest û kontrola mutlak a partiyê hatibû avakirin.

**Rêbaza karkirinê**

Meclisê qanûn amade nedikirin, tenê biryar û biryarnameyên serokkomar û hikumetê bi yek dengî pesend dikirin. Ji sedî 50'î zêdetirê kursiyan pêşwext ji bo Partiya Baasê û hevalbendên wê (Eniya Niştimanî ya Pêşverû) dihatin veqetandin. Tu endamekî meclisê nediwêrî siyasetên dewletê, artêşê an dezgehên ewlehiyê rexne bike. Karê endaman tenê cîbicîkirina fermanên rejîmê û parastina berjewendiyên çîna desthilatdar bû. Di heman demê de berî ku her biryar an nîqaşek bikeve rojevê, diviyabû erêkirina saziyên ewlehiyê (mûxaberat) hebûna. Li ser asta parêzgeh û bajaran jî meclisên herêmî ne ji bo xizmeta gel, lê wekî şaxên çavdêriyê yên rejîmê dixebitîn. Mafê dengdanê yê her kesî/ kesê jî tune bû.

**Îro rêyeke nû li pêşberî hilbijartina ye**

Sûriyaya nû di kêliyek siyasî ya girîng re derbas dibe ku tê de pêdiviyên destûrî bi tevliheviyên rewşa li ser erdê re li hev dikevin. Lidarxistina rûniştina yekem a Meclisa Gel û avakirina wê, digel mekanîzmayên hilbijartina endamên wê, wekî ceribandinek rastîn a cidîbûna qonaxa veguhêz û şiyana wê ya çêkirina saziyên bi bandor, nemaze yên yasadanînê, derdikevin pêş. Dîroka ku ji hêla serokê hikumeta demkî, Ehmed el-Şaraa ve hatî ragihandin, bûye sembola têkoşîna li dijî dem û rastiyê, nemaze ji ber derengketina têkildarî hilbijartinên li Parêzgeha Hesekê ku niha wekî astengiya herî hesas di pêvajoya temamkirina avakirina Meclisê de xuya dike.

**Meclisa Gel a Sûriyê ji 210 kursiyan pêk tê**

Lijneya Bilind a Hilbijartinên Meclisa Gel a Sûriyê di sala 2025'an de hejmara kursiyên her parêzgeheke Sûriyê destnîşan kir. Lijneya biryara hejmar 24 ya sala 2025'an da ku pişta xwe dide danezana destûrî û mersûmên hejmara 66 û 143 yên sala 2025'an. Li gorî biryarê kursiyên her parêzgeheke Sûriyê di Meclisa Gel de hatin diyarkirin û li gorî wê parêzgeh Helebê 32 kursî, Şam 10 kursî, Gundewarê Şamê 12 kursî, Hums 12 Kursî. Herwiha Hema 12 kursî, Hesekê 10 kursî, Laziqiye 7 kursî, Tertûs 5 kursî, Dêrazor 10 kursî, Reqa 6 kursî, Idlib 12 kursî, Dera 6 kursî, Siwêda 3 kursî û Qunêtera 3 kursî. Pêştir, Lijneya Bilind ya Hilbijartinên Meclisa Gel a Sûriyê biryara dabû hilbijartin ku dê nîvê Îlonê pêk werin, li parêzgehên Siwêda, Reqa û Hesekê paş bixe. Hejmara giştî ya kursiyên Meclisa Gel 210, di serdema desthilata Esed de jî, ji 250 kursiyan pêk dihat.

**Paşguhkirin**

Dîsa paşguhkirin di hilbijartina kursiyan de çêdibe, di heman demê de dengdan wekî daxwazên gel be jî, ew zêde ne diyare. Li hemberî vê rastiya derketiye holê ew e ku hêz û partiyên Kurdî li Sûriyê veqetandina tenê çar kursiyan ji bo pêkhateya Kurdî di Meclisa Gelê Sûriyê de ji 210 kursiyan red kirin, ji ber ev yek mezinahiya rastîn a nifûsa Kurd li welêt nîşan nade. Van hêz û partiyan jî destnîşan kirin ku; Di demekê de ku pêkhateyên Sûriyê li bendê ne ku dewleteke hemwelatîbûn û şirîkatiyeke rastîn ava bikin, herwiha rêyeke siyasî ya giştî peyda bikin ku dawî li dehan salên dûrxistinê bîne, gel bi hilbijartinên Meclisa Gel a Sûriyê matmayî bû. Tayînkirinên di bin navê hilbijartinên Meclisa Gel a Sûriyê hat rexnekirin û hate destnîşankirin ku tayînkirinên bi vî rengî nûnertiya îradeya Sûriya hemûyan nake, di heman demê de siyasetên nijadî, dûrxistin û paşguhkirinê yên li dijî Kurdan dubare dike.

Ji ber sînordarkirina nûnertiya Kurdan bi 4 kursiyên lawaz ji nav 210 kursiyên Meclisa Gel, xapandineke aşkere ye li ser rastiyên demografî û siyasî yên li ser erdê ye. Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê pêkhateyeke resen û dîrokî ye û rêjeya wê ne kêmî tevahiya nifûsa Sûriyê ye, bi rêya van tayînkirinên sîstematîk ji dengê xwe yê rastîn û mafê xwe yê parvekirî di biryardana nîştimanî de bê par tê hiştin. Hêz û partiyan diyar kirin ku ew nûnertiya rastîn a parlamenî dibînin ku ne kêmtirî 40 kursiyan be ji bo kesên ku bi awayekî zelal xwedî ramanên neteweyî yên Kurdî ne û doza wî ya dadperwer diparêzin, ev yek jî li gorî rêjeya nifûsa rastîn a pêkhateya Kurd e.

**Sîstema Meclisa Gel a rasteqîn divê wiha bin:**

Meclisa gel di avakirina welatekî demokratîk, adil û serbixwe de bingeha herî sereke ye, ji ber ku ew vîna rasteqîn a gel nûner dike û desthilatdariyê ji destê kesekî an partiyekê derdixe û dide xwediyên wê yên rastîn. Giringiya meclisa gel ji bo avakirina welat di van xalan de kurt dibe:

Qanûnên adil: Meclis li gorî daxwaz, pêdivî û mafên civakê qanûnan amade dike.

Parastina mafan: Qanûnên ku têne derxistin, mafên hemû pêkhate, ol û çîna diparêzin û nahêlin sîstema zordariyê ava bibe.

Rêgirtina li dîktatoriyê: Meclis çavdêriyê li ser karên hikumetê û saziyên dewletê dike, da ku gendelî (fesadî) û xirab bikaranîna desthilatdariyê, çênebe.

Hesabpirsîn: Mafê meclisê heye ku wezîran an berpirsiyaran bîne pêşberî gel û gava şaştiyek hebe wan ji kar dûr bixe.

Nûnertiya berfireh: Di mecliseke rasteqîn de, hemû netewe (Kurd, Ereb, Suryan hwd…), di nav de jin, ciwan û çînên cuda cih digirin. Ev yek hesta wekheviyê xurt dike.

Çareserkirina pirsgirêkan: Alozî û daxwazên gel bi rêya diyalog û nîqaşên di bin banê meclisê de bi awayekî aştiyane têne çareserkirin.

Rola jin: Divê jin bi qasî hejmara mêran cihê xwe di biryardayîna meclisê de bigirin.

Dabeşkirina bûdeceyê: Meclis biryarê li ser bûdceya welat dide, plan dike ka dê çiqas dirav ji bo perwerde, tendurustî, çandinî û avadaniyê were xerckirin.

Plana stratejîk: Projeyên mezin ên ku paşeroja welat û nifşên nû diyar dikin, di meclisê de têne pejirandin.

# Dema şer dibe polîtîkayeke sîstematîk; Şerê Îsraîl û Lubnanê

Ji 1948'an heya roja îro gelek caran şer û pevçûn di navbera Îsraîl û Lubnanê de çêbûne, ji avabûna Hizbullahê ve êdî hincetên Îsraîl ên êriş û operasyonan zêdetir bûne. Ev şer di hemdemî û mêjûya xwe de, dikeve nav planên Îsraîl ên Rojhilata Navîn a nû.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

### Zincîra şerê Israîl û Lubnanê

Ji avabûna Israîlê ve heta niha, şer û pevçûn di navbera wê û Lubnan û Huzbullahê de gelek caran rû daye, hem jî peyman hatine îmzekirin. Di serê der şerê 1948 heya 1949'an: Lubnan beşdarî şerê 1948'an bû û Peymana Agirbesta Giştî di sala 1949'an de bi bavbênkariya Neteweyên Yekbûyî de hate îmzekirin. Ev peymana dawî ya yekser û fermî di navbera her du welatan de ma, lê ew agirbest bû, ne peymanek aştiyê bû.

Şerê 1968'an: Di sala 1968'an de Îsraîlê êrîşên asmanî li ser Balafirgeha Beyrûtê da destpêkirin, ev yek ji girîngtirîn qonaxên êrîşa Îsraîlê ya li dijî Lubnanê bû. Ev êrîş beşek destpêkê ya dîrokeke dirêj a êrişan bû ku beriya êrişên mezin û piştî wan jî berdewam kir.

Şerê 1978'an: Di 15'ê Adara 1978'an de Îsraîlê Operasyona Lîtanî bi beşdariya 20 hezar leşkerî dest pê kir. Di nav çend rojan de, nêzîkî 2 hezar û 20 kîlometre çargoşe ji axa Lubnanê dagir kir. Di encamê de hêzên PLO ji başûrê Çemê Lîtanî hatin derxistin, li Abbasiye, Xiyam û Qunînê komkujî pêkhatin û koçberiyek mezin çêbû. Ev yek berî ku Biryara 425 a Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî were pejirandin û UNIFIL'ê were damezrandin da ku alîkariya vekişînê û vegerandina aramiyê bike, pêkhat.

Şerê 1982'yan: Dagirkirina mezin a Îsraîlê ya Lubnanê di Hezîrana 1982'an de pêkhat. Hêzên Îsraîlê piştî dorpêçkirineke ku bi hefteyan hat domandin, gihîştin Beyrûtê. Şer bi derxistina PLO ji Beyrûtê û jinûveşekildana bi zorê ya hevsengiya hêza Lubnanê bi dawî bû. Yek ji encamên wê yên rasterast derketin, ew jî avabûna Hizbullahê bû da ku li hemberî hebûna Israîlê di başûrê Lubnanê de bisekine.

Şerê 17'ê Gulana 1983'yan: Hikumeta Serokwezîr Şefîq el-Wezran, di bin Serok Emîn Gemayel de, Peymana 17ê Gulanê bi Îsraîlê re îmze kir. Ew peymana dawîanîna dijminatiyê, rêkeftinên ewlehiyê û vekişînên hevbeş destnîşan dikir. Lêbelê, ew ji hêla siyasî ve têk çû û qet nehat bicîhanîn, ji ber vê yekê nekarî aştiyek rastîn an çareseriyek aram bi dest bixe.

Şerê 1985 heya 2000'î: Piştî vekişîna ji Beyrût û deverên din, Îsraîlê li başûr herêmek biewle ji bo xwe parast, ev yek jî bû sedema şerekî dijwar û demdirêj ê bi Hizbullahê re. Armancên sereke yên dagirkirina sala 1982'an hatin lawazkirin. Di dawiyê de Îsraîl neçar ma ku di sala 2000'an de jê vekişe.

Şerê Tîrmeha 1993'yan: Îsraîlê Operasyona Tesfiyekirina Hesaban, li Lubnanê an jî wekî Şerê Heft Rojan jî tê zanîn, da destpêkirin. Nakokî bi têgihîştinek nenivîskî ya ku ji hêla Washingtonê ve hatî navbeynkarkirin, li ser bingeha nearmancgirtina sivîlan bi dawî bû. Hizbullah qebûl kir ku ji avêtina roketan ber bi bakurê Îsraîlê ve dûr bisekine li hember ku Îsraîl ji lêdana sivîl û hedefên sivîl li Lubnanê dûr bisekine. Belge behsa vê têgihîştinê dike wekî yek ji du têgihîştinên ku qaîdeyên pevçûnan li eniya sînor rêk û pêk dikin.

Şerê Nîsana 1996'an: Îsraîlê Operasyona Enaqîd Elxeddeb da destpêkirin, bi Peymana Nîsanê ya ku di 26'ê Nîsana 1996'an de hate ragihandin bi dawî bû. Ev têgihîştin destnîşan kir ku sivîlên her du aliyan jî dê nebin hedef û mekanîzmayek çavdêriya navneteweyî ava kir da ku gilî û raporên binpêkirinan werbigire.

Şerê Gulan û Hezîrana 2000'î: Di vê salê de Israîl ji başûrê Lubnanê vekişiya û Neteweyên Yekbûyî Xeta Şîn ava kir da ku vekişînê bişopîne. Bi vê yekê dagirkirina rasterast a Îsraîlê ya piraniya başûr bi dawî bû, lê ne pevçûn û ne jî pirsgirêka xalên nakokî bi dawî nebûn.

Şerê Tîrmeh-Tebax 2006'an: Şerê Tîrmehê piştî operasyona sînorî ya Hizbullahê dest pê kir û 34 rojan dom kir. Berî ku biryara 1701 a Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî di 11'ê Tebaxê de were pejirandin Îsraîlê bi kampanyayeke hewayî ya berfireh dest pê kir û piştre hewl da ku êrîşî Marûn Elras, Bint Cbeil û Wadî Elhujeir bike. Rawestandina şer di 14'ê Tebaxê de ket meriyetê dema ku rola UNIFIL hat nîşandan û Artêşa Lubnanê li başûrê Çemê Lîtanî bi cih bû.

Şerê Cotmeha 2023 heya 27'ê Mijdara 2024'an: Piştî ku Hizbullah dest bi gulebaranê ji bo piştgiriya Hamasê kir, li ser sînor eniyeke berfireh derket û di sala 2024'an de pevçûn veguherî şerekî berfireh. Ev şer berî ku di 27'ê Mijdara 2024'an de peymana agirbestê bikeve meriyetê, ji aliyê hedefgirtina binesaziya sivîl û tenduristiyê, bikaranîna teknolojiya îstîxbaratê û kuştinan ve, mezintirîn û hovanetirîn şer bû.

Şerê ji 2'yê Adara 2026'an heta 14'ê Nîsana 2026'an: Piştî ku Hizbullah di 2'yê Adarê de êrîşî Israîlê kir, şer di asteke mezin de ji nû ve dest pê kir. Israîlê bi operasyoneke hewayî û bejayî li Lubnanê bersiv da. Di 14'ê Nîsana 2026'an de bi navbeynkariya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, li Washingtonê di navbera nûnerên Lubnan û Îsraîlê de danûstandinên rasterast dest pê bûn, di demekê de ku şer bi dawî nebûbû. Di dema agirbesta di navbera Israîl û Lubnanê de li Lubnanê 380 kes ji ber êrişên Israîlê hatin kuştin. Di demekê de ku Lubnan û Israîl ji bo gera nû ya danûstandinan li Washingtonê amadekariyan dikin, artêşa Israîlê êrişên kujer berdewam dikin, bi taybetî li başûrê Lubnanê. Li gorî rayedaran, ji dema ku agirbest di 17'ê Nîsanê de ket meriyetê, herî kêm 380 kes hatine kuştin.



### Girîngiya Lubnan ji bo Israîlê

Lubnan ji bo Israîlê tenê welatekî cîran nîne, lê herêmek stratejîke ku bi ewlehî, siyaseta herêmî û hevsengiya hêzê ya Rojhilata Navîn re girêdayî ye. Ji sala 1948'an û avabûna Dewleta Israîlê ve, têkiliya her du welatan di nav şer, agirbest û pevçûnan de maye. Her çend di navbera wan de peymanên aştiyê yên fermî tune bin bi dirêjahiya dîrokê, lê şer û dijminatiya li ser sînor her dem aliyekî sereke yê siyaseta herêmî ya Israîlê ye. Girîngiya Lubnanê ji bo Israîlê pêşî ji cihê wê yê erdenîngarî tê. Başûrê Lubnanê rasterast bi bakurê Israîlê ve girêdayî ye û her tevgereke leşkerî ya li wir dikare ewlehiya Israîlê bike bin barê gefan. Ji ber vê yekê Israîlê gelek caran hewl daye ku li başûrê Lubnanê herêmek biewle ava bike an jî hêzên dijber ji sînorê xwe dûr bixe. Operasyona Lîtanî ya sala 1978'an û dagirkirina mezin a 1982'an di vê çarçoveyê de têne dîtin. Ji aliyê din ve hebûna Hizbullahê ji bo Israîlê yek ji mezintirîn pirsgirêkên ewlehiyê ye. Hizbullah piştî dagirkirina 1982'an ava bû û bi alîkariya Îranê bû hêzeke leşkerî û siyasî ya mezin. Hizbullah ji bo Israîlê ne tenê rêxistineke Lubnanî ye, lê yek ji hêzên xeternak ya ku Israîlê wê weke gef ji xwe re dibîn ye, ku Îran, Sûriye û komên. Roket, dron û teknolojiya leşkerî ya Hizbullahê gelek caran Israîlê hedef girtine. Ji ber vê yekê Israîl şerê li dijî Hizbullahê wekî şerekî ewlehî û stratejîk dibîne. Herwiha Lubnan ji aliyê siyasî û aborî ve jî girîng e. Israîl dixwaze ku li sînorê bakurê xwe aramiyê bi dest bixe da ku bikaribe li ser pirsgirêkên din yên herêmî, wekî Gaza an jî Îranê, bêtir bisekine. Di heman demê de gaz û çavkaniyên deryayî yên Rojhilata Deryaya Spî jî girîngiya stratejîk a Lubnanê zêde kirine. Her nakokiyek li ser sînorê deryayî dikare bandorê li projeyên enerjiyê û bazara navneteweyî bike, ne xasim riya aborî ya Çîn-Kendava Erebî-Israîl-Ewropa. Lê eger em baş li vê mijarê binerin em ê bibînin ku Israîl bi çavê dagirkirinê li Lubnanê dibîne nexasim herêma başûrê wê.

### Şerê hemdemî yê di çarçoveya planên herêmî de:

Şerê dawî yê 2023 heya 2026'an encamên giran li her du dewletan hişt. Li Lubnanê gelek binesazî, nexweşxane û bajar hatin wêrankirin û kirîza aborî ya heyî bêtir kûr bû. Herwiha, hejmareke mezin ji sivîlan koçber bûn û ewlehiya civakî lawaz bû. Ji aliyê Israîlê ve jî şer bû sedema neewlehiya li bakur, xerabûna aborî û zêdebûna xeteriyê li ser ewlehiya navxweyî. Di asta herêmî de, ev şer dikare bibe sedema guhertina hevsengiya hêzê li ser asta Rojhilata Navîn, berdewambûna şer jî wê Sûriyê, Îraq, Mesir û gelek welatên hawirdor jî bixe nav qada şerekî giran, nemaze şerê ku di navbera Îran, DYA û Israîl de hişt bandorê li herêmê û tevahiya cîhanê bike. Eger Hizbullah hêza xwe biparêze, Israîl wê hîna jî gefên êrişan bixwe. Lê eger şer bibe sedema lawazbûna Hizbullahê, Israîl dikare vê yekê wekî serkeftinek stratejîk bibîne. Di her du rewşan de jî aştiya domdar hîn ne xuya ye ji ber ku bingehên siyasî û dîrokî yên nakokiyê hîn nehatine çareserkirin. Şerê ku niha rû dide, tevî ku du caran agirbest ji 18'ê Nîsanê ve hatiye ragihandin jî, lê hîna jî şer berdewam e, ev şer jî dikeve çarçoveya şerê herêmî yê Rojhilata Navîn, hem jî bi şerê li dijî Hizbullahê bi şerê Israîl li dijî Îran ve girêdayî ye.



## Plana li dijî Başûrê Kurdistanê!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk ragihand ku yekem karwanê wê yê tiranzît di deriyê Girê Spî re, li nava xaka Rojavayê Kurdistanê re û di deriyê Til Koçer re derbasî xaka Îraqê dibe.

Ev riya behsa mijarê bi armanca di serî de planeke li dijî destkeftiya gelê kurd e. Ji bo xeniqandina Başûrê Kurdistanê di aliyê aborî de ye. Dewleta Tirk beriya niha deriyê Ibrehîm Xelîl a di navbera Başûr û Bakur de wekî deriyê sereke yê di navbera Îraq û Tirkiyê de bû. Niha û ji ber hikûmeta demkî ya Sûriyê di destê dewleta Tirk de ye, ji wan re riya di ser axa Sûriyê de hîn zêdetir bi sûde.

Di aliyê siyasî de jî dê li ser Başûrê Kurdistanê wekî zexteke siyasî û aborî were bi kar anîn. Dewleta Tirk li şûna di çarçoveya pêvajoya aştiyê de gavan bavêje, bi hemû rê û rêbazan dixwaze destkeftiyên gelê kurd derbe bike. Xendeqên di navbera Dêrika Rojava û Bakurê Kurdistanê de jî di vê çarçoveyê de têne kolandin. Nerîna min daxuyaniya berpirsê ENKS'eyî Mihemed Ismaîl a li ser ''Têkçûyîna konfransa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî'' jî ji plana behsa mijarê ne dûre. Dewleta Tirk hewl dide ne li Rojava û ne jî li Başûr destkeftiyên gelê kurd nemîne. Wê jî bi siyaseteke nerim û qirêj dide meşandin.

Ev siyasetên dewleta Tirk di demekê de gelê kurd û tevgera azadiyê ji bo serxistina pêvajoya ''Banga Aştî û Civaka Demokratîk'' de hemû hêza xwe seferber kiriye, pêk tê. Ev jî rastiya aliyan nîşan dide. Mijara entegrasyona di navbera Rojava û hikûmeta demkî ya Sûriyê de jî ji ber siyasetên dewleta Tirk û destwerdana wê tê astengkirin. Hakimiyeta wê ya li ser Sûriyê û destwerdana wê di nava xaka Sûriyê de, siyaseta li Sûriyê wekî qezenceke siyasî di mijara doza kurd li Bakurê Kurdistan û Tirkiyê bi kar bîne.

Ji ber wê û li beranberî siyasetên qirêj ên dewleta Tirk û hikûmeta Îraqê ji her demê zêdetir pêwîstiya gelê kurd bi yekîtiya netewî heye. Mijara metirsî û xeteriya heyî ne tenê li ser Rojava ye. Lê belê metirsî li ser tevahî gelê kurd e. Hikûmeta AK/MHP'ê bi daxuyaniyan dixwaze demê qezenc bike. Derveyî wê heta niha tiştekî cidî pêk ne anîne.

Lê heger gelê kurd bi yek helwest û yek nerîn hêza xwe kir yek, bi aştiyane û dûrî şer dê karibe gavên mezin bavêje. Ji lewra daxuyaniya rayedarên ENKS'yî Mihemed Îsmaîl a derbarê Konfransa Yekrêzî û yekhlwestiya Kurdî de li dijî berjewendiya tevahî gelê kurd û di serî de Başûrê Kurdistanê ye.

Li şûna van daxuyaniyan divê PDK'ê jî di nav de tevahî partiyên Kurdistanê bi cidî li ser lidarxistina Kongreya Netewî bixebitin. Ev kongreya Netewî ji bo tevahî parçeyên Kurdistanê qezenceke. Bi tayebet di vê demê de li her çar aliyên welat guhertinên mezin têne jiyankirin.

Em meze bikin, li Rojava mijara entegrasyona bi hikûmetê re, li Bakurê pêvajoya aştîyê, li Rojhilat guhertinên li Îranê û êrişên Amerîka. Li Başûrê Kurdistanê jî hewldanên xeniqandina aborî û siyasî li dijî Başûr tê meşandin.



# Paşveçûna asta perwerdeyê di Rojhilata Navîn de

Ji ber rewşa Rojhilata Navîn a tevlihev û hebûna şer, koçberî, wêranbûna dibistanan, belavbûna madeyên hişbir, bandora teknolojî, siyseta desthilatdaran û hwd…asta xwendin û perwerdeyê bi awayekî berbiçav paş ketiye.

**Aryen Hesen**

Em niha di serdema teknîk û teknelojiya de ne ew jî xaleke sereke ye ku bandorê li ser pêşxistina asta perwerde û xwendinê li Rojhilata Navîn dike. Ger em vegerin serdemên borî em dibînin ku li gorî derfetên kêm asta xwendin û perwerdeyê li pêş bû, ji ber ku xwendin xala sereke ji bû pêşxistina civakê bû.

### Li gorî derfetên kêm jêhatiyên xwendinê

Di serdema borî de li Rojhilata Navîn derfetên xwendinê kêmbûn, teknîk zêde pêş neketibû û zanist jî sînordar bû. Herwiha astengî di milê siyasî jî de hebû, qedexekirina xwendina bi zimanê dayîkê li gelek welatên Rojhilata Navîn jî pirsgirêk bû, di navbera gund û bajaran de rê tune bûn û derbaskirina rê gelek zehmet bû, herwiha rewaş aborî ya malbetan gelek xerab bû, derkefet nedida ku amûrên pêwîst ji bi dibistan û xwendinê bikirin, lê tevî van astengiyan jî xwendekar sekeftî û zîrek bû. Di hemen demê de li beramberî kêmbûna teknolojiya, asta mamost û minhacan bilindid bû û xwendekar jî pileyên bilind bidest dixistin. Herwiha xwendekar bi agahiyan dagirtî, terz û serkeftî ji qonaxên perwerdeyê derdiçûn. Di heman demê de ji bo nifşên din dibûn pêşeng.

Gelek malbetan ji ber zihniyata paşverû derfet nedidan keçan ku bixwînin an jî piştî refa 6'an xwendina xwe berdewam bikin, lê li hemberî astengiyan wan xwendina xwe berdewan dikirin û dibûn xwedî bawername.

### Derfetên zêde û kêmbûna asta xwendinê

Niha cîhan di serdema pêşketin, guhertin û avakirinê de ye û derfetê pêşkêtinê jî gelek in. Lê tê dîtin ku li gorî hemû pêşketin û derfetên xwedinê xwendekar ji perwerdeya xwe dûrdikevin û xwasteka fêrkirinê li gel wan kêm dibe. Herwiha malbet hemû derfet, xwestek û amûrê wan peyda dike da ku xwandina xwe berdewam bikin, lê hezkirina xwandin û fêrkirinê li gel xwendekaran kêm bûye. Gelek ji xwendekaran ne bi îrade û daxwaza xwe derbasî dibistanan dibin, lê belê bi zora malbeta xwe derbas dibin, eger



xwastek li cem xwendevan tune be, nikarin pêşketinê jî di xwe de ava bikin. Li piraniya welatên herêmê, perwerdehî li ser hînbûna ezberî ava bûye û xwendina rexneyî an hezkirina pirtûkan nayê teşwîqkirin. Hebûna hemû derfetan carinan dibe sedem ku xwendekar tu zehmetiyê nebînin û hewceyî bi hewldan an xebatê wekî xwendina pirtûkên kûr hîs nekin. Dema ku zarok her tiştî bêyî ked û hewldan bi dest bixin, nirxê tiştan di nav de pirtûk û perwerdehî di çavê wan de namîne. Meraqa hînbûnê tenê dema ku mirov hewcedariyê hîs bike çêdibe. Herwiha gelek caran jiyan û pêwistiyên zarokan bi rehetî ji aliyê malbetê ve ji wan re tê dayîn, ev jî dibe sedem ku zarok bar raneke û pêwistiyê bi xwendinê nebîne. Herwiha gelek caran ji aliyê malbetê ve pêşeroj û beşê xwendinê ya xwendekaran xuya dibe, ev dibe sedem ku sarbûna xwendinê li cem xwendekaran çêbibe ev hemû sedemên ber bi çavin ku dihêlin xwandekar ji xwendin û perwerdeya xwe dûr bikeve.

### Mecbûriyeta dûrketina ji perwerdê

Gelek sedem hene ku dihêlin bi dare zorê xwendekar ji perwerdeya xwe dûrbikevin. Li Rojhilata Navîn ji ber şer û êrişên berdewam, xerabkirina dibistanan, koçberî, xizanî û hwd.. dihêlin ku xwendekar ji perwerdeya xwe dûr bikevin. Koçberî dibe sedem ku xwendekar ji dibistanê xwe qût dibin ev jî dibe sedem ku derûniya xwendekaran xerab bibe û nikaribin careke din ji nû ve dest pê bike. Herwiha derbaskirina madeyên hişbirê di nava xwendekar û zarokan de dibe sedema ku ciwan li ber madeyên hişbirê bikeve, mêjiyê xwe winda bike û dest ji pêşeroja xwe berde. Ji ber rewşa xizaniyê ya ku di Rojhilata Navîn de zêde ye zarok mecbûr dimînin ku dest ji xwendina xwe berdin û bi malbetê re alîkar bin. Herwiha nexwaşî ji sedemeke herî mezin e ku xwendekar ji perwerdeya xwe dûrbikevin. Dikare were gotin ji ber rewşa şer di Rojhilata Navîn de jîngeha guncaw ji xwendekaran re peyda nabe.

### Bandora teknolojî û kapîtalîzmê

Em niha di serdema teknolijiyê de jiyan dikin ku teknolojî bi awayekî ne normal pêşketiye, ev pêşketina teknolojî çiqas erêniya xwe heye li beramberî wê jî ewqas neyîniyên wê hene. Pêşketina teknolojiyê di milekê de beş e, lê ew kesê ku bikar tîne diyar dike ku wê li gorî berjewendiya wan be an na. Di heman demê de bi her pêşketinek li ser cîhanê çêdibe re kapîtalîzim jî xwe pê re mezin û belavtir dike. Êdî pêşketin bûye tirs li ser zarok û ciwanan ji ber ku pêşketina teknolojiyê ne di milê berjewendiya xwe de bikartînin, lê belê di milê neynî û xerabûnê de tê bikaranîn. Lîstoka pobcî û bi seden lîstokên mîna wê ku bandoreke mezin li ser ciwanan çêkiriye, xwendekar ji xwendin, malbet, civak û derdor dûrketine. Lîstoka pobcî di 2018'an de derket pêş, lê belê di 2022'an de gelek pêşket û bi awayekî ne normal di nava civakê de belav bû, di nava dibistanan de mijara xwendekaran lîstoka bobcî bû ku çawa ew biserket, divê çawa bilîzin û hwd….

Herwiha di dema me ya niha de hişê çêkirî (chat GPT) gelek pêşketiye, zarok û ciwan li şûna ku mêjiyê xwe bikarbînin, dibînin ku hêsantire hişê çêkirî bikar bînin û ev dibe sedema paşketina şaneyên mêjî, newestandina mejî û xwe dispêrin hişêr çêkirî. Ev yek jî bi zihniyeta kapîtalîzmê hatiye çêkirin.

### Siyaseta dûrxistina ji xwendinê

Xwendin bingeha pêşketina civakê ye, rê û resmên civakê bi xwendinê tê nîşankirin. Herwiha asta pêşketina xwendinê asta pêşketina civakê diyar dike. Di dema niha de metirsiyên mezin li ser pêşxistina xwendinê çêdibe, desthilatdar têdighêje ku civakek dikare bi rêya xwendinê pêş bixe û li dijî desthilatdariyê derkeve, ji ber wê bi her awayî û siyasetên cûr bi cûr hewil dide ku xwendekaran ji xwendinê dûrbixe û dilsar bike, herî zêde siyaseta xwe di aliyê teknolojiye de pêşxistiye. Bi firikên ku bala ciwan bikşîne dixebite ji ber ku ciwan di temenê xwe yên ciwantiyê de ne meraq dikin ku her tiştî nasbikin û li pey kevin.

Di Rojhilata Navîn de siyaseta dûrxistinê ji xwendinê, kêmbûna asta zanînê û bezandina li pey dewletê re tê meşandin. Bi awayê aborî û siyasî hewaldidin ku xwendekaran ji perwerdeyê dûrbixin da ku nikaribin kar bikin ji bo herdem bi hacetî dewletê bin. Rewşa aborî li Rojhita Navîn xerab bûne, buha zêde bûye û li beranberî wê dahatî nînin ev jî ji planên dewletê hatiye ku ciwan mecbûr bimînin dest ji xwendinê berden û biçin ji bi berjewendiya dewletê kar bikin. Ji ber ku mijarên herî sereke di jiyana mirovan de di destê dewletê de ye mecbûre ku li gorî wan biçin û dengê xwe nekin. Dikare were gotin xwendekar bûne qurbaniya berjewendiyên kes û dewletan ku bi wan planên xwe pêkbînin. herwiha gelek dewlet naxwazin ku diva gel ango xwendekarên wan de pêşketin çêbibe dam ku li hember siyaseta wan dernekevin.

### Çareserî çi ye?

ji bo çaresriyê û pêşxistina civakê, pêwîste civak xwe bide îsbatkirin ku ew dikare li hember siyasetên cûr bi cûr yên desthilatdariyê, derkeve.

Yek ji girîngtirîn rêya çareseriyê di nava belavkirin û nîşankirina rêya rast ji bo pêşxistina xwendinê ev jî em dikarin bi rêya semîner, meş û çalakî di nava dibistan, peymangeh û zanîngehan de ji bo pêşxistina zimanê xwe û parastina xwendina xwe di nava xwendekaran bidin meşandin û bighêjin wê baweriyê ku bi parastina ziman û xwendina xwe parastina civaka xwe dikin, herwiha pêşxistina xwedinê pêşxistina civakê ye…

**Bîra Civakê**



## Civakbûna li dora nirxên xwe bibe xeleka zincîrê, dikare bidome

**Ehmed Hesen**

Weke çawa afirîneriyên xwedayî di nava cîhanê de weke pîroziyên bi nirx tên dîtin û hurmet û parastina wan tê kirin, nirxên civakê jî bi heman ferasetê xwedî qîmt in. Ev nirx hema bi xwe nebûne nirxên giranbiha, lê belê di encama bedeldayîn û keda hezar salan a civakan de wisa lê hatine ku bibin xwedî pîroziyek, di serî de ji afirîneriyên destpêkê yên civaka xwezayî bigire heta 103 meyên jinê yên ku ji aliyê zilamê baviksalar ve hatine dizîn, dîsa ji çêkirina amûrên destan bigire heta danîna kevirê yekem ê şaristaniya civakî heta avahiya roja me ya îro ku kêlî bi kêlî mezin dibe, hemû jî di encama parastina nirxên civakî yên madî û manewî de derketine holê. Norm: Ji rêgezên çandî yên bi riya pergala perû û ciza kirinê derdikevin û bandorê li ser lebatên kesan dikin re tê gotin. Nirx, xwediyê hêza 'dayîn kirinê' ne. Nirx, mekanîzma kontrolkirina nirxan in. Nirx, şiklê jiyana endamên civakê bi lebatên çandî diyar dike. Kes, bi saya serê van nirxên civakî yên tixwîbê mebest û lebatên mirovan diyar dikin, dikare di derbarê lebatên kesên din yên endamê civakê ne texmîn bike. Yanê di kîjan rewşê de kesek wê çawe bilive, mirov li gor nirxan dikare texmîn bike. Bi saya serê van nirxên civakî mirov weke civakekê bi hevre dijîn. Mînak têkiliyên malbatê, dayîn û standina di nava gundî û cîranan de, keft û lefta civakê ya ji bo hilberîniyê û hwd li gor nirxên civakî pêk tê.

Ev hebûna cîhanî jî ne di encama kedxwariyê de pêk hat, lê belê berhema keda milyon salan a mirovan e ku dane ser hev û heta roja me ya îro hatine.

Civak, li gor pêdiviyên civakê yên bingehîn, pergala normên civakî ji xwe re ava dike. Navê vê pergalê ji 'sazîbûn'e. Mînak ol, perwerdehî, malbat û hwd. Her saziyekê ji di nava demê de nirx û normê xwe çêdike û civak li dora van nirx û norman kom dibe. Kes, şiklê jiyana xwe, hest û liven xwe, têkilî û dayîn û standinên xwe, li gor nirx û normên civaka kû ew di navde dijîne li hevtîne.

Di dirêjahîya dîrokê de bi qasî ku sermaye û dewletdarî bi hemû qonaxên xwe li ser piyên koleyan ava bûbe, ewqas jî jiyan û berhemên ku niha di destên me de encama keda mezin a civakan e. Dîsa li vir gotina ku dibêje "ji nebûnê hebûn, ji tarîtiyê ronahî afirîn" muhra xwe li vê dîroka pîroz a civakî dide. Tiştên ku îro bi hêsanî tên afirandin û bikaranîn ji teknolojiyê bigire heta avakirina bajar û asîmanxaneyan hemû jî encama zayîna zanebûna civakên di dîrokê de cih girtine ye. Di roja îro de çendîn em behsa pêşketinên rûdidin bikin jî, em ê nikaribin hevrûkirineke rast di navbera çêkera civakî ya ji beriya 8 hezar sal û çêkera civaka roja îro de bikin, ji ber ku berê her tişt bi keda mejî û destan diqedî, niha bi keda teknolojiya û lezbûna wê diqede, li vir ez nabêjim teknolojiya jî ne berhema mirov e, lê belê ji mirov re bi qasî ku rê li ber hêsanbûnê vekir, ewqas jî derî li afirîneriya mejî girt, divê li şûna wê dîsa hêza afirêneriya mejiyê civakî xwe bidaya pêş. Ji ber ku ev nebû, afirêneriya xwezayî bû milkê cîhana hişê çêkirî û hêdî hêdî ji bin serweriya mirov derdikeve. Her nirxeke ku bi keda civakê bê qezenckirin û bikaranîn ewqas dikare di pêşeroja wê civakê de ronîdar bibe. Weke encam hêza civakî bi qasî ku xwedî li nixên xwe derkeve û bide parastin, ewqas jî bi azadiyan re dibe yekpare.